

**K.T.**  
**ZANÎNGEHA VAN YÛZÛNCÛ YILÊ**  
**ENSTÎTUYA ZIMANÊN ZINDÎ**  
**MAKEZANISTA ZIMAN Û ÇANDA KURDÎ**

**DI LÎSTIKÊN ZAROKAN DE CIYÊ ZÛGOTINOKAN**

**TEZA LÎSANS A BILIND**

**AMADEKAR**

**HABÎBE YÎĞÎT TAŞTAN**

**ŞÊWIRMEND**

**Prof. Dr. VECIHÎ SÖNMEZ**

**WAN - 2019**



T.C.  
YÜZÜNCÜ YIL ÜNİVERSİTESİ  
Yaşayan Diller Enstitüsü

TEZ KABUL TUTANAĞI  
YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ MÜDÜRLÜĞÜNE

Prof. Dr. Vechi SÖNMEZ danışmanlığında, Habibe YİĞİT TAŞTAN tarafından hazırlanan “**Di Lîstikên Zarokan De Ciyê Zûgotinoktan**” adlı bu çalışma, 25/06/2019 tarihinde aşağıdaki jüri tarafından Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalı’nda Yüksek Lisans Tezi olarak kabul edilmiştir.

**Başkan(Danışman)** : Prof. Dr. Vechi SÖNMEZ

İmza: .....

**ÜYE** : Dr. Öğr. Üyesi Kemal KAYA

İmza: .....

**ÜYE** : Dr. Öğr. Üyesi Mazhar TUNÇ

İmza: .....

**ÜYE** : .....

İmza: .....

**ÜYE** : .....

İmza: .....

ONAY: Yukarıdaki imzaların, adı geçen öğretim üyelerine ait olduğunu onaylarım.

25/06/2019  
Prof. Dr. Murat DEMİREL  
Enstitü Müdürü

Teza Lîsansa Bilind

Habibe YİĞİT TAŞTAN

ZANÎNGEHA VAN YÛZÛNCÛ YILÊ

ENSTÎTUYA ZIMANÊN ZINDÎ

Hezîran, 2019

DI LÎSTIKÊN ZAROKAN DE CIYÊ ZÛGOTINOKAN

### KURTE

Zûgotinok, bi lihevanîna peyvên biwate an jî bêwate; biqafiye û bi awayekî ahengî tên çêkirin. Zûgotinok carinan di nav lîstikan de, carinan di çîrokan de, carinan di mamikan de cî digirin carinan jî bi awayê serbixwe derdikevin pêşberî me. Zûgotinok ji hêla teşeyê ve ne helbest e, lê ji aliyê rîtm û vegotinê ve parçeyek ji helbestê ye. Zûgotinokên ku zarok çêdikin, yekem berhemên wêjeyî ên zarokan in. Naverok û bikaranîn jî zarokane ye û dinyaya zarokan dide der. Zarok di lîstikên xwe de, di henekên xwe de, di nav civata xwe de cî didin zûgotinokan û wan ji bo coş zewqa jiyana xwe bi kar tînin.

Ev xebat jî li ser zûgotinokên nava lîstikên zarokan e. Bi vê xebatê me xwest em bi giştî wek cureyekî edebiyata gelêrî, zûgotinokê bidin nasîn û zûgotinokên nav lîstikên zarokan binirxînin. Xebat, bi giştî li ser 286 zûgotinokên hatiye kirin. Ev zûgotinok ji gelek herêman hatine girtin. Zûgotinok bigiştî hatine senifandin û zûgotinokên lîstikên zarokan ji hêla fonksiyon, teşe û varyantê ve hatine nirxandin. Bi vê xebatê derket holê ku, di kurdî de, zûgotinokên lîstikên zarokan bi armanca balkişandin, zêdekirina coş û zewqa lîstikê, hilbijartina pîrik an jî endamên lîstikê, ji bo neqandinê; carinan li serê lîstikê carinan jî li seranserê lîstikê tên gotin. Li gor teşeyê xwe jî zûgotinokên lîstikên zarokan carinan li gor qaîde û quralekê carinan jî bi awayekî serbest hatine çêkirin. Lê ev yek ne ku bi zanebûn pêk hatiye. Dema zarok zûgotinokan çêdikin ev rewş bi awayekî xwezayî derdikevin holê.

**Bêjeyên Sereke:** Zûgotinok, Folklor, Edebiyata Zarokan, Lîstikên Zarokan, Kurdî.

Yüksek Lisans Tezi

Habibe YİĞİT TAŞTAN

VAN YÜZÜNCÜ YIL ÜNİVERSİTESİ

YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ

Haziran, 2019

ÇOCUK OYUNLARINDA TEKERLEMELERİN YERİ

## ÖZET

Tekerleme anlamlı ya da anlamsız sözcüklerin bir araya gelerek oluşturduğu, bazen kafiyeli bazen kafiyesiz, söyleminde belli bir agengi olan kalıp sözlerdir. Tekerlemeler bazen oyunlarda, bazen masallarda, bazen de bilmece şeklinde, bazen de bağımsız söz kalıpları olarak karşımıza çıkarlar. Tekerlemeler kalıp olarak şiir olmasalar da ritm ve söyleniş açısından şiirin bir parçasıdır. Çocukların ürettiği tekerlemeler onların ilk edebi ürünüdür. Tekerleme çocuk edebiyatının bir ürünü olmakla beraber, kullanımı da söylenmesi de çocuksudur ve çocukların dünyasını yansıtır. Çocuklar tekerlemeyi oyunlarında, şakalarında, arkadaş ortamında, yaşamın bir çok alanında eğlence amaçlı kullanır.

Bu çalışmada da çocuk oyunlarında söylenen tekerlemeler ele alınmıştır. Genelde kürtçe tekerlemelerin tanıtılması, özelde çocuk oyunlarında söylenen kürtçe tekerlemelerin araştırılması amaçlanmıştır. Çalışmada 286 tekerleme kullanılmış olup bu tekerlemeler farklı farklı yörelere aittir. Tekerlemelerin tamamı sınıflandırıldı ve çocuk oyunlarında söylenen tekerlemeler fonksiyon ve şekil yönüyle değerlendirildi ve varyant analizi yapıldı. Çocuk oyunlarında söylenen Kürtçe tekerlemeler, dikkat çekmek, oyunun coşku ve heyecanını arttırmak, oyunda dikkatin dağılmasını önlemek; bazen ebe seçimi, bazen oyuncu belirlemek için, bazen de eleme amaçlı kullanılır. Bazen oyunun başında söylenir bazen de oyuna eşlik ederler. Şekil bakımından ise, bazen belli bir kafiyeye göre söylenmiş, bazen de serbest bir şekilde oluşmuşlar.

**Anahtar Sözcükler:** Tekerleme, Halkbilimi, Çocuk Edebiyatı, Çocuk Oyunları, Kürtçe

M.Sc. Thesis

Habibe YİĞİT TAŞTAN

VAN YÜZÜNCÜ YIL UNIVERSITY

INSTITUTE OF LIVING LANGUAGE

June, 2019

THE PLACE OF NURSERY RHYMES IN CHILD PLAYS

### ABSTRACT

Nursery rhymes are pattern statements which are combined by meaningful or meaningless words, rhymed or unrhymed words but which also have an harmony in the pronunciation. Nursery rhymes are seen sometimes in plays, tales, riddles and sometimes independent from these patterns. Even if Nursery Rhymes are not seen as a poem because of its form, they can be seen as a part of poem in terms of rhythm and pronunciation. The Nursery Rhymes that children produce are actually their first literary work. In addition to its being belonged to children's literature, Nursery Rhymes are also childish in terms of usage, pronunciation and it reflects children's world. Children use Nursery Rhymes in their games, jokes, and in many part of their lives as a means of fun.

This study deals with the Nursery Rhymes which are being used in games. Generally it is aimed to present the Kurdish Nursery Rhymes and we also researched the the Kurdish Nursery Rhymes that are in games. In this study, there are 286 Nursery Rhymes and they belong to different regions. All these Nursery Rhymes were classified and the ones which are used in games were evaluated in terms of form and function and variant analysis was made. The Kurdish Nursery Rhymes in games are sometimes used to draw attention, enhance excitement and enthusiasm, prevent distractibility, choose EBE (a term used in games) choose players and sometimes to eliminate players. Sometimes it is said at the first time or during the games. They are sometimes in a certain rhyme but sometimes freely rhymed in terms of their form.

**Key Words:** Nursery Rhym, Folklore, Children's Literature, Children's Play, Kurdish

## NAVEROK

KURTE .....	I
ÖZET.....	II
PÊŞGOTIN .....	V
DESTPÊK .....	1
BEŞA YEKEM .....	4
1.1. ZÛGOTINOK; WEKÎ NAV, TÊGEH Û CURE .....	4
1.1.1.Pênaseya Zûgotinokê .....	4
1.1.2.Di Kurdî De Navên Ku Li Zûgotinokan Tê Kirin.....	5
1.1.3. Bingeha Zûgotinokan .....	5
1.1.4.Di Zûgotinokan De Meseleya Cureyan.....	7
1.2. SENIFANDINA ZÛGOTINOKAN .....	8
1.2.1. Li Gor Pertev Naili Boratav Senifandina Zûgotinokan.....	8
1.2.2.Li Gor Şükrü Elçin Senifandina Zûgotinokan .....	8
1.2.3.Li Gor Dogan Kaya Senifandina Zûgotinokan .....	9
1.2.4. Li Gor Ali Duymaz Senifandina Zûgotinokan.....	11
1.2.5.Li Gor Mevlüt Özhan Senifandina Zûgotinokan .....	13
1.2.6.Senifandina Zûgotinokên Kurdî .....	14
1.3. CUREYÊN ZÛGOTINOKÊN KURDÎ .....	15
1.3.1.Zûgotinokên Girêdayî Cureyên Edebiyata Gelêf.....	15
1.3.2.Zûgotinokên Li Ser Meh û Demsal û Gerestêrkan.....	30

1.3.3.Zûgotinokkên Rojên Taybet.....	33
BEŞA DUYAN .....	35
2.1.ZÛGOTINOKÊN LÎSTIKÊN ZAROKAN .....	35
2.1.1.Fonksiyonên Zûgotinokên Lîstikan .....	35
2.1.2.Cureyên Zûgotinokên Lîstikan.....	36
2.1.2.1.Zûgotinokên Ji Bo Neqandin An Jî Hilbijartinê Têl Gotin .....	36
2.1.2.2.Zûgotinokên Ku Di Nava Lîstikan De Têl Gotin .....	37
2.1.2.3.Zûgotinokên Ku Bi Lîstina Peyvan Çêdibin .....	47
2.1.2.4. Zûgotinokên Pesin,Bizar, Heqaret û Biçûkxistinê .....	50
2.1.2.5.Zûgotinokên Ku Ji Bo Şabûnê, Xweş Wext Derbaskirinê Têl Gotin ....	51
2.1.2.6.Zûgotinokên Dua û Daxwazan.....	52
2.1.2.7.Zûgotinokên Bi Bandora Perwerdeyê Çêbûne.....	54
2.2.Avanîya Zûgotinokên Lîstikan.....	55
2.3.Di Zûgotinokan de Meseleya Varyantê.....	61
2.4.Têkiliya Lîstik û Zûgotinokan.....	87
ÇAVKANÎ .....	90
PÊVEK 1.....	93
PÊVEK 2.....	97

## PÊŞGOTIN

Di nav xebatên kurdolojiyê de xebatên li ser wêjeya zarokan xwedan pareke kêr in. Di nav xebatên heyî de jî mijara zûgotinokan kêr caran bûye mijara xebatan. Zûgotinok di temenê zaroktiyê ewil de ji bo pêşketina qabîliyeta rîtmê, muzîkê û pêşketina axaftina zarokan xwediyê roleke girîng e. Zarokên ku di temenê biçûk de hînî zûgotinokan dibin di pêşerojê de meyl û qabîliyeta wan a muzîkê rîtmê zêdetir dibe. Ji ber vê yekê zûgotinok ji bo perwerdeya muzîkê ya pêşdibistanê bingeheke xurt ava dike. Li aliyekî din zûgotinok perçeyekî xurt yê lîstikên zarokan e. Ji ber vê yekê ku ciyekî herî zêde zûgotinok lê tê bikaranîn jî lîstikên zarokan e. Dema meriv berê xwe dide xebatên li ser zûgotinokên kurdiya kurmancî yên li Tirkîyê hatine kirin, ji xeynê çend xebatên biçûk meriv rastî xebateke berfireh nayê. Xebatên heyî jî, tenê çend xebatên berhevkarîyê û çend xebatên nirxandinê yên biçûk in. Meriv xwe nagihîne nirxandineke bi rêk û pêk, kategorîzekirineke zanistî, veçirîneke teşeyê ya berfireh. Me jî xwest, bi terzeke zanistî vê qada ku kêr hatiye vekolîn, bikolin û veçirînin û çilkekê li xebatên kurdolojiyê zêde bikin.

Ji ber kêmaniya derfetan û kêmbikaranîna kurdî ya li Tirkîyê, berhemên wêjeya zarokan her roj tune dibin. Her çiqas kêr-zêde karên berhevkarîyê hebin û ev berhem hatibin berhevkin jî ne fonksiyonel in. Çimkî bi awayekî zanistî, li gor rê û rismên zanistî nehatine senifandin û nirxandin. Wekî ku tê zanîn zûgotinok jî perçeyek ji wêjeya zarokan e û wan jî nesîbê xwe ji arîşeyên wêjeya zarokan girtiye. Ev xebat, çirûskêkî be jî, ji bo çareserkirina arîşeyên mijara zûgotinokan rê li ber xebatên din veke.

Wekî ku me behs kir, ji ber ku li Tirkîyê xebatên li ser zûgotinokan kêr in, di vê xebatê de ji bo mijarên teorîk yên li ser zûgotinokan, me bi piranî ji xebatên tirkî sûd wergirt. Ji bo berhevkarîna zûgotinokan jî me ji kesan, ji xebatên berhevkarîyê û ji xebatên televîzyonên kurdî; Pêlîstank TV, Helhelok TV û Zarok TV yên li ser înternetê belavbûyî, zûgotinok berhevkin.



Di pêvajoya amadekirina vê xebatê de, di serî de ji ber keda wî ya hem madî hem manevî ya ji bo pêşketina xebatê û ji bo pişgiriya wî ya ji bo wergera îngilîzî ya kurteya xebatê, ji hevjinê xwe Yusuf TAŞTAN re; ji bo parvekirina nîşe û xebatên xwe yên heyî û keda wî ya mezin a ji bo pêşketina xebatê ji Mehmet YILDIRIMÇAKAR re; ji bo alîkarî û nirxandinên wî yên ji bo tezê ji şewirmendê xwe Prof. Dr. Vecihi SÖNMEZ re spas dikim.

Habibe YİĞİT TAŞTAN



## DESTPÊK

Di dinyayê de tu tişt bê çand nîne, ji însanan heta ajalan ji ajalan heta giyayan her tişt xwedî çandekê ye, giyayê ku li deştê şîn dibin yên ku li serê çiya şîn dibin û yên ku li bostanan şîn dibin hemû ji hev cuda ne, li gor hewayê li gor germê, li gor sermayê li gor heriyê teşe û cureyê wan diguherin, hinek ji wan kulîlk vedidin hinek ji wan tîn xwarin bi tehm in, hinek ji wan jehrî ne. Însan jî wisa ne, li gor şert û mercê jiyane teşe girtine û bi vî awayî terzeke jiyane derketiye holê. Xwezayê teşe daye însanan, însanan teşe daye xwezayê bi vî awayî, çand çê bûye. Ferqa însanan ji ajal û giyayayan ew e ku bi tenê di nav çandê de çênebûne, teşe dane çandê û ji wê çandê berhem dane ku gelek cureyê berheman derketine holê. Di nav van berhemên de wêjeya devkî bi roleke xwe ya girîng heye, û di nav wêjeya devkî de jî berhemên ji bo zarokan û berhemên zarokan qadeke giringtirîn e. Ji ber ku zarok pêşeroja mirovahiyê ne, berdewamiya çand û civakê ne. Zarok, di nav dîrok û pêşerojê de wekî pirê ne. Ew bi tenê berdewamiya çandê nîn in, di bingeha afirandina berhemên çandî de jî xwedî roleke xwe ya mezin in.

Zûgotinok, yek ji berhemên zarokan ya girîng e ku meriv dikare bêje berhema ewil a zarokan e. Çimkî zarok lîstikên xwe bi zûgotinok an jî bi gotinan dewlemend dikin; an yên ku berê ji ber kirine dibêjin an di jiberkirinên xwe de çiyê ku ji bîr dikin bi gotinên nû dihonin an jî yên nû diafirînin. Ji ber ku zûgotinok xwedî aheng û kêf û zewqê didin, zêdetir meyla zarokan diçe ser zûgotinokan. Ji ber vê zarok zûgotinokan, zêdetir ji bo xweş dem derbas bikin an jî coş û kêfa lîstikên xwe zindî bigirin, bi kar tînin. Her wiha zûgotinok bi piranî weke lîstik derdikeve pêşberî me. Bi vê mebestê me jî di vê xebatê de di serî bi giştî zûgotinok nixandî û pişt re bi taybetî li zûgotinokên lîstikên zarokan hûr bûn.

Di pêvajoya vekolîna vê xebatê de dema me berê xwe da xebatên li ser zûgotinokên kurdiya kurmancî yên li Tirkiyê hatine kirin, ji xeynê çend xebatên biçûk me xebateke berfireh nedît. Xebatên ku me dest xistin jî, tenê çend xebatên berhevkarîyê û çend xebatên nixandî yên biçûk bûn. Mesela, nixandîneke bi rêk û pêk, kategorîzekirîneke zanistî, veçirîneke li ser teşeyê me nedît. Me jî bi vê xebatê xwest, vî cureyê edebiyata gelêrî ya kurdiya kurmancî vekolin û veçirînin da ku li

nav xebatên kurdolojiyê belav bikin û bidin nasîn. Li ser van esasan me di xebata xwe de, zûgotinokên nav kurdên kurmanc ên li Tirkiyê bi kar anîn û di xebatê de jî mebesta me ya ji bo peyva kurdî, kurmancî û ya ji bo peyva kurd tenê kurmanc in. Me ev yek jî ji bo ku îfadeyên dirêj dubare nebin û qeşbalixiyeke zêde di nava metnê de çênebe û fêmkirina metnê dijwar neke, tercîh kir.

Di vê xebatê de bi giştî 286 zûgotinok esas hatine girtin. Ji van zûgotinokan hinek me bi xwe ber hev kirine, hinek ji kesên ku berhevkirine girtine, xeynê wê hinek jî me ji xebatên hatî kirin girtine û tevî xebata xwe kirine. Zûgotinokên ku me berhev kirine, me bi hev dîtînin rû bi rû ji kesan girtine û qeyd kirine. Di nav xebatê de jî me ev zûgotinok bi tîpa “K” kod kirine û wek “K<sub>1</sub>, K<sub>2</sub>...” bi nav kirine û agahiyên derheqê berhevkarîya wan de di Pêvek 1’ê de dane. Wekî din hin zûgotinokên ku jê hêla Abdullah Yaşın ve hatine berhev kirin, me eynî bi forma zûgotinokên ku me berhev kirine, nişan dane û bi K<sub>10</sub> bi nav kirine.

Hemî zûgotinokên nav xebatê ku 286 heb in, bi hejmaran hatine nîşankirin û di Pêvek 2 de, tevî çavkaniyên wan hatine rêz kirin. Dema zûgotinok di metnê de hatine dayîn tevî hejmarên xwe hatine dayîn, ji ber vê di nava metnê de dubare çavkaniyên wan nehatine nîşandan. Wekî din ji bo her sernavê mînakên zûgotinokan hatine dayîn. Cihê ku mînakên sernavê zêde bin, ji bo ku metin belawela nebe, me hin mînak wek metin dane, mînakên mayî jî tenê wek hejmar dane.

Xebata me ji du beşan pêk tê. Di beşa yekem de bi gelemperî zûgotinok û zûgotinokên kurdî hatin nîqaş kirin. Di vê beşê de, di serî de em li ser pênaseya têgeha zûgotinokê sekinîn ku ka zûgotinok çi ye, jêdera wê çi ye û navên kurdî yên ku di nav gel de li zûgotinokan tên kirin çi ne û çi cure zûgotinok hene. Pişt re em li ser senifandina zûgotinokan sekinîn ka di lîteraturê de zûgotinok ji hêla senifandinê ve çawa hatine nîqaş kirin û senifandin. Me di vî warî de, ji xebatên li ser zûgotinokên tirkî hatine kirin, sûd wergirt. Çimkî di vî warî de ji xeynê xebateke bicûk, xebateke li ser zûgotinokên kurdî hatiye kirin me bi dest nexist. Di çarçoveya senifandinê van xebatan de me zûgotinokên kurdî kategorîze kirin û li gor zûgotinokên li ber destê me, me senifandina zûgotinokên kurdî kirin.

Di beşa duyem de em li ser zûgotinokên lîstikên zarokan yê kurdî sekinîn. Me di vê beşê de zûgotinokên lîstikên zarokan li gor fonksiyonên wan kategorîze kirin. Pişt re me ev zûgotinok ji hêla avaniya û teşeyê wan ve nirxandin. Li aliyekî din jî me ev zûgotinok ji li gor varyantên wan kategorîze kirin û nirxandin.



## BEŞA YEKEM

### 1.1. ZÛGOTINOK; WEKÎ NAV, TÊGEH Û CURE

#### 1.1.1. Pênaseya Zûgotinokê

Têgeha “zûgotinok” ji hêla gelek kesan ve hatiye pênasekirin. Folklornasê tirk Pertev Naili Boratav, dema zûgotinokê pênase dike dibêje pênasekirina zûgotinokê gelekî dijwar e û zûgotinokê wek perçeyekî çanda zarokan dide nasandin. Li gor wî zûgotinok berhema lîstikên zihnî û ya xeyalan e ku bi cambaziya peyvan çêdibin (Boratav, 2015, s. 155).

Mustafa Öztürk di xebateke xwe ya li ser zûgotinokan de ji bo zûgotinokan dibêje ku zûgotinok, cureyek ji edebiyata gelêrî ye û li gelemperiya deverên kurdan, ji aliyê her cure nifşên mirovan ve, taybetî ji aliyê zarokan ve tê gotin. Ev gotin ji nifşên kevn bi awayekî devkî gihîştîye heta nifşên îroyîn. Zûgotinok; wekî qewlêrk, mamik, biwêj, lawij, destan û hwd. di nava edebiyata gelêrî de cureyekî girîng û serbixwe ye. Her wiha ji ber ku zûgotinok bi pîvan, bi serwa û bi aheng jî tê vegotin, di naveroka helbesta kurdî ya gelêrî de jî tê bicihkirin (Öztürk, 2016, s. 23-43).

Mihemedê Kurdo di pêşgotina xebata xwe ya berhevkarîyê ya li ser zûgotinokan de ji bo zûgotinokan wiha dibêje zûgotinok, hêmaneke edebiyata gelêrî ye ku ji bo rewaniya zimên ji bo hişyarî û baldariya dafikên zimên, ji bo kêf û coşa lîstik û çîrok û xebroşkan tên gotin. Lîstik bi wan dest pê dikin û bi wan diqedin. Berê wan fireh e, carinan li gotinên pêşiyar carinan li biwêj û mamikan carinan li nifir û duayan difesilin. Di zûgotinokan de mijareke diyarkirî nîne, hinek ji wan xwedî mane ne, hinek ji wan bê mane ne. Di hinek zûgotinokan de deng û peyvên nêzî hev û gotina wan zehmet hene mirov wextê wan zû dibêje dixelîte. Zûgotinok ji ber ku bi qafiye ne rewan in û gotina wan hem xweş û hem jî zor e (Kurdo M. , 2017, s. 5).

Zûgotinok, bi gelek awayan tê pênase kirin. Belku meriv dikare bêje zûgotinok, gotinên carinan biwate carinan bêwate ne û li ser nêzîkbûna dengê peyvan ava dibin (Yardımcı, 2004, s. 75).

### 1.1.2. Di Kurdî De Navên Ku Li Zûgotinokan Tê Kirin

Zûgotinok wekî cure û teşe rewşa wê nahitiye zelalkirin. Di navlêkirina zûgotinokan de jî lihevkirinek tune ye û navlêkirin carinan li gor hereman diguhere carinan jî li gor teşe bikaranînê diguhere. Li ser vê mijarê xebatek ango lêkolînek berfireh nîne. Zana Farqînî di ferhenga xwe de ji bo zûgotinok; çîvanok, lihevanînok, qinik, bizelêv bi kar anîye (Farqînî Z. , 2011). Heciyê Cindî di pirtûka xwe de ji bo zûgotinokan yakxane (Cindî, 2009, s. 120) bi kar anîye, lê tu şîrove tune bi tenê wek serenav yek xane bi kar anîye û tê de ji xeynê zûgotinokan cureyên cuda jî hene, em nizanin ku gelo Heciyê Cindî ev gotin bixwe afirandiye yan di nav civakê de bikaranînek wiha heye yan na.

Mustafa Öztürk dibêje binavkirina zûgotinokan li gorî deveran diguhere û di vê mijarê de yekîtiyek çênebûye. Li gorî agahiyên ku xwe gihandiyê gotiye ku zûgotinok li gor deveran cuda cuda bi navên wek zûbêjok, zorbêjok, zûgotinok, zorgotinok, tiştanok, çîvanok, qinik, bizelêv, nezanok, bizelêvan, mamik, çistan, zanîşk tê binavkirin (Öztürk, 2016, s. 23-43).

Dema ku me li ser vê mijarê lêkolîn kir me bi taybetî li kesên dibistan nexwendî û ji bajarên cuda cuda pirsî û navên wek û zûgotin, zûgotinok (Mêrdîn), lezbare (Diyarbakir), çîvanok, tiştik (Îdir), şaşmîtik ku ji bo yên bi lîstika peyvan çê dibin re tê gotin (Wan), derketin holê.

### 1.1.3. Bingeha Zûgotinokan

Ji bo ku em zanibin zûgotinok di eslê xwe de ji ku hatiye û çawa veguheziye bûye zûgotinok, pêdiviyên me bi xebatan heye. Lê di vê mijarê de me di kurdî, zaravayê kurmancî de xebat bi dest nexist, ji ber vê me dêna xwe da xebatên derdorên xwe û zimanên din ku ji me re jî rêyek nîşan bidin.

Zûgotinok bi piranî bê wate ne û girêdayê cureyên cuda ne , di hin cureyên xwe de jî ser bixwe ne. Di vî warî de Alî Duymaz dîyar dike ku ji ber dûrketina eslê xwe, zûgotinok ji wateya xwe zêdetir, bi şeklê îfadeyê û bi cureyên din ve tê nirxandin. Zûgotinok ji civata xwe û ji fonksiyona xwe dûr ketiye, ji ber vê jî wekî peyvên bêwate mane” (Duymaz, 2002, s. 13).

Li gor P.N.Boratav jî, li Anatolyayê zûgotinok herî kêr ji sed sala XIII'an destpê dike. Helbestvanên ku di vê serdemê de jiyane di serî de mewlana û helbestvanên din di berhemên xwe de vê terzê bi kar anîne (Boratav, 2009, s. 53).

Ji bo ku meriv bingeha zûgotinokan baş tê derxe, dîvê li helbest, qewlêrk, stranên dengbêjan, mamikan, çîrokan bê nihêrtin. Boratav di xebata xwe de diyar dike ku zûgotinokên dirêj di serî de çîrok bûne û bi deformasyonê xerabûne yan jî kin bûne, û îxtîmaleke mezin bûne zûgotinokên serê çîrokan (Boratav, 2009, s. 53). Ev agahî ji bo kurdî giring e ku di kurdî de çîrokên di teşeyê zûgotinokê de hene. Çîroka navdar a Kêzaxatunê mînakeke baş e. Şewaz zûgotinok e lê naverok çîrok e, wekî din jî gelek zûgotinok hene ku wek çîrokên kurt in. Jixwe meseleya navlêkirina çîvanokê jî vê meselê xurtir dike, him ji çîrokan re çîvanok tê gotin him jî hin cureyê zûgotinokan re. Îxtîmaleke mezin zûgotinokên serê çîrokan çîvanok in.

Alî Duymaz di bingeha zûgotinokan de 8 mijaran nîşan dide:

- Serbestiya zêhna zarokan
- Xewn û xeyal
- Esrar, vexwarin, serxweşî
- Esrîmeya şamantîyê
- Tesawif
- Derew
- Mubalaga û surrealîzm
- Mîzah (Duymaz, 2002, s. 15-19).

Helbet bandora şamantîyê bitenê jibo yên tirk derbasdar e lê xalên din û ji bo yên kurdî jî derbasdar in. Wekî din meriv dikare ji bo zûgotinokên kurdî çend xalên din jî lê zêde bike:

- Bandora olê
- Derûnî û binhişê civakê
- Ji bo kurdî qewlêrkên Êzdiyan,
- Ajal
- Demsal, xweza

#### 1.1.4. Di Zûgotinokan De Meseleya Cureyan

Di wêjaya devkî de meseleya cure û fonksiyonê giring e. Di gelek beşan de em dibînin ku ev mesele çareser nebûye. Mesela li îdirê extiyarekê zûgotinoka hêklo mêklo got min got ev çi ye got ev tiştik e, dema tiştanok got ji bo tiştanok jî got tiştik e. Balkêş e ku Boratav di pituka xwe de dibêje ku li hin ciyan (Alamanya, Estonya) ji zûgotinokan re tiştanok, mamik jî tê gotin (Boratav, 2009, s. 53).

Heman pirsgirêk di tirkî de jî heye Nerîn Yayın di xebata xwe de diyar dike ku di tirkî de jî meselaya cure û fonksiyonan çareser nebûye û di wêjaya devkî de diyarkirina cureyan carinan li gor ezgîyê û carinan jî li gor bikaranînê yanî li gor fonksiyonê dibe. Ji bo zûgotinan jî heman tişt derbasdar e (Yayın, 2009, s. 2), wekî ku Nerîn Yayın jî diyar dike, di wêjaya devkî de cure û fonksiyon li gor bikaranînê diguhere. Wek mînak:

181. Çil derzî,

Çil û çar derzî,

Qula derziyê de bezî?

(Ta)

Di vê mînakê de wek mamik hatiye gotin di vê rewşê de her çiqas teşe wek zûgotinok be jî ji ber ku di dawiyê de pirs têkirin dibe mamik.

155. Derzî derzî çil derzî

Derzî di qulika derziya diya min de bezî.

Di vê mînakê de jî wek zûgotinok hatiye bikaranîn. Di navbera herdu mînakên de ferq bi tenê di vegotinê de ye. Di mînaka yekem de ji ber ku di dawiyê de pirs tiştêkî dike dibe mamik, di mînaka duyem de pirs tune û sê caran dubare dixwaze ji ber vê him ji aliyê vegotinê ve him jî ji aliyê teşeyê ve dibe zûgotinok. Gelek mamik ji hêla vegotina xwe ve dişibin zûgotinokan, lê ji ber fonksiyona xwe dibin mamik.



Cure û fonksiyon bi tenê ne di nav cureyên cuda de, hin cure di nav xwe de jî li gor bikaranîna cîyê xwe fonksiyona wan diguhere, mesela dema zûgotinok di lîstikan de tê bikaranîn dibe zûgotinokên nav lîstikan, dema di çîrokan de tê bikaranîn dibe zûgotinokên nav çîrokan.

## **1.2. SENIFANDINA ZÛGOTINOKAN**

Ji bo senifandina zûgotinokan me ji xwe re xebatên lîterartura tirkî esas girtin. Dema meriv berê xwe dide xebatên tirkî, di tirkî de jî ji bo senifandina zûgotinokan nêrînên cuda cuda derdikevin pêş merivan. Bêguman di tirkî de meriv berê xwe dide kîjan xebatê navê ku derdikeve pêş Pertev Naili Boratav e. Di warê zûgotinokan de xebatên Boratav xwedan nirxekî giranbuha ne. Ji xeynê Boratav kesên wek Ali Duymaz, Nerin Yayın, Doğan Kaya, Şükrü Elçin û çend kesên din derdikevin pêş. Em ê jî li jêr ev senifandinên ku ji hêla van kesan ve hatine kirin pêşkêş bikin ku ji bo senifandina zûgotinokên kurdî rê li ber me veke.

### **1.2.1. Li Gor Pertev Naili Boratav Senifandina Zûgotinokan**

Kesê ji hêla xebatên zûgotinokan ve li Tirkiyê kedeke mezin daye bê guman Pertev Naili Boratav e. Boratav di berhema xwe ya bi navê 100 Soruda Halk Edebiyatı de zûgotinok kiriye çar beş:

Zûgotinokên Çîrvanokan

Zûgotinokên Lîstikê

Zûgotinokên Merasîman

Zûgotinokên ji Lîstika Peyvan Pêk tên (Boratav, 2015, s. 166).

### **1.2.2. Li Gor Şükrü Elçin Senifandina Zûgotinokan**

Elçin di berhema xwe ya bi navê “Halk Edebiyatına Giriş” de zûgotinokan wiha disenifîne:

Zûgotinokên Kurt

Zûgotinokên ji Lîstika Peyvan Pêk tên

Mijarên Curbicur

Zûgotinokên Lîstikên Zarokan

Zûgotinokên Çîrvanokan

Zûgotinokên Çîrokan (Elçin, 2000).

### 1.2.3. Li Gor Dogan Kaya Senifandina Zûgotinokan

Kaya, di berhema xwe ya bi navê “Anonim Halk Şiiri” de wiha senifandiye:

A.Zûgotinokên Zarokan

1.Zûgotinokên Lîstikan

a. Zûgotinokên ji bo Hilbijartina Pîrikê

b. Zûgotinokên Nava Lîstikê

2. Zûgotinokên Dî Dema Çêkirina Eşya û Pêlîstokan de Tê Gotin

B. Zûgotinokên Çîrvanokan

C.Zûgotinokên Nameyan

D. Zûgotinokên Merasîman

1.Merasîmên Rojên Taybet

2.Merasîmên Zayînê

3.Merasîma Beranberdanê

4.Merasîmên Çinînê(dirûtinê)

5.Merasîmên Cejnan

6.Merasîmên ji bo Baranê

E.Zûgotinokên Dua û Daxwazan

1.Duayên Baranê

2.Duayên Dema Ezanê

3.Duayên Beriya Razanê ku Di Nav Nivînan de Tê Xwendin

4.Duayên Dûrxistina Seyan

5. Duayên di dema Ezmûnan de Têna Xwendin

6. Duayên Ji bo Zarokan Têna Kirin

a. Duayên ji bo meşîna Zarokan Têna Kirin

b. Duayên Ji Bo Tenduristiya Zarokan Têna Kirin

7. Duayên Ji Bo Xuslê Têna Kirin

8. Duayên Piştî Çinînê Têna Kirin

9. Duayên Ji Bo Dûrxistina Teyrên Dirende

10. Daxwazên Ji Bo Hevîr

11. Nêta Ji Bo Rojîya Remezanê

12. Duayên Piştî Xwarinê

13. Zûgotinokên Dema Hilatina Hîvê

14. Zûgotinokên Dema Hilatina Tavê

15. Zûgotinokên Di Demên Xetere de Têna Gotin

16. Zûgotinokên Ji Bo Destpêkirina Kar

17. Zûgotinokên Ji Bo Daxwazan

F. Zûgotinokên Di Dema Îcrakirina Lîstikan De Têna Gotin

G. Zûgotinokên Ji Bo Sedemên Cur bi Cur Têna Gotin

1. Zûgotinokên Navan

2. Zûgotinokên Ji Bo Şîretê

3. Zûgotinokên Ji Bo Şîfayê

4. Zûgotinokên Ji Bo Hînkirina Axaftinê

5.Zûgotinokên Ji Bo Filitîna ji Nezerê

6.Zûgotinokên Fehlan

7.Zûgotinokên Ji Bo Razandina Zarokan

8.Zûgotinokên Kantoyê

9.Zûgotinokên Ji Bo Meha Remezanê Têna Gotin

10.Zûgotinokên Lêziman

11.Zûgotinokên Silavê

12.Zûgotinokên Ji Bo Pêşbaziya Sporê

13.Zûgotinokên Ji Bo Sunetkirinê

14.Zûgotinokên Ji Bo Mêvanan

15.Zûgotinokên Elîfbayê

16.Zûgotinokên Ji Bo Temenê

H.Zûgotinokên bi Guherîna Stranan Hatine Çêkirin

#### **1.2.4. Li Gor Ali Duymaz Senifandina Zûgotinokan**

Duymaz di xebata xwe ya bi navê Îrfanî Arzulayan Sözlere Tekerlemeler zûgotinok wiha senifandine:

A.Zûgotinokên Girêdayî Lîstik, Merasîm an jî Metnekê

I.Zûgotinokên Lîstikên Zarokan

a.Bijartin an jî ji lîstikê derxistina pîrikê

b.Zûgotinokên Nava Lîstikan

c.Şaşmîtok

d.Zûgotinokên bîzar û biçûkxistinê

- e.Zûgotinokên Gazîkirina Lîstikê û Belavkirina Lîstikê
- f.Zûgotinokên Di Dema Çêkirina Pêlîstokan de Têna Gotin

## II. Zûgotinokên Merasîman û Olî

### 1. Zûgotinokên Merasîman

#### a.Zûgotinokên Ji bo Gavên Yekem yêna Jiyanê

- 1.Nav Danîn
- 2.Danûkê Diran
- 3.Sunnet
- 4.Zewac
- 5.Mirin

#### b.Merasîmên Civakî

- 1.Cejnên Biharê
- 2.Merasîmên Duayên Baranê
- 3.Nexweşî
- 4.Merasîmên Ajalvaniyê
- 5.Merasîmên Çandiniyê
- 6.Cejnên Çinînê
- 7.Şandina Leşkeriyê
- 8.Zûgotinokên Derheqê Cejn û Merasîmên Olî

### 2.Zûgotinokên Bawerîyan

- a.Zûgotinokên Derheqê Hêmanên Xwezayê de
- b.Zûgotinokên Ji bo dehfa Bela û Nexweşîyan
- c.Zûgotinokên Derheqê Bawerî û Pratîkên Wê de
- d.Zûgotinokên Derhek Qederê de (Fal)

## III. Zûgotinokên Girêdayî Cureyên Edebiyata Gelêrî

- a.Zûgotinokên Çîrvanokan
- b.Zûgotinokên Mamikan
- c.Zûgotinokên Çîrokên Gelêrî

IV. Zûgotinokên Lîstikên Temaşeyê û Zûgotinokên Girêdayî Şahiyên Gel

- a.Zûgotinokên Orta Oyunu
- b.Zûgotinokên Meddahan
- c.Zûgotinokên Şahî û Pêşbaziyan Sporê Yên Nav Gel (Guleş)

B. Zûgotinokên Wêjeya Nivîskî

I.Zûgotinokên Aşîk Edebiyatî

II.Zûgotinokên Wejeya Tekke û Tesewifê

III.Zûgotinokên bi Guhertina Metnên Edebî Çêbûne

C.Zûgotinokên Din (Duymaz, 2002, s. 26-27).

**1.2.5. Li Gor Mevlüt Özhan Senifandina Zûgotinokan**

Özhan, di xebata xwe ya bi navê *Çocuk Oyunları* de zûgotinok wiha senifandiye:

a.Zûgotinokên Çîrvanokan

b.Zûgotinokên Lîstikan

1.Zûgotinokên ji bo Gazîkirina Lîstikê

2.Zûgotinokên ji bo hîlbijartina pîrikê

3.Zûgotinokên Nava Lîstikê

4.Zûgotinokên ji bo teşwîqkirina lîstikê û Hêrskirina Lîstikvanan

5.Zûgotinokên Dawiya Lîstikê

c.Zûgotinokên Merasîman

d.Şaşmîtok (Özhan, 1997, s. 45-52).

### 1.2.6. Senifandina Zûgotinokên Kurdî

Wekî li jor hat hat diyarkirin, di tirkî de her çiqas gelek xebat li ser zûgotinokan hatibin kirin jî, li ser senifandina zûgotinokan hê jî îxtilafek heye ku kesên me senifandinên wan nîşan dan giregirên folklora tirkî ne. Di warê sinifandina zûgotinokên kurdî de jî em tenê rastî xebateke Mustafa Öztürk hatin. Öztürk di xebata xwe de zûgotinokan dike sê beş:

#### 1. Zûgotinokên Lehîstikî:

Öztürk vî cureyê zûgotinokan jî dike du beş

a. Zûgotinokên Bijartinê

b. Zûgotinokên di Nava Lehîstikan de

#### 2. Zûgotinokên Xeberoşkî

#### 3. Zûgotinokên Serbixwe

Dema meriv berê dide mînakên zûgotinokên kurdî, ev senifandin ji bo zûgotinokên kurdî kêr dimîne. Ango wextê meriv mînakên zûgotinokên kurdî li bêjînga vê senifandinê dixê gelekê wan li derveyî vê senifandinê dimînin. Di vê xebatê de çarçoveya senifandinê ku ji bo zûgotinokên tirkî hatine çêkirin û li gor mînakên zûgotinokên kurdî yê hatî bidestxistin, ji bo zûgotinokên kurdî ev senifandin derket holê:

#### 1. Zûgotinokên Girêdayî Cureyên Edebiyata Gelêrî

##### 1.1. Zûgotinokên Mamikan

##### 1.2. Zûgotinokên Çîrokan

##### 1.2.1. Zûgotinokên Li Serê Çîrokan

##### 1.2.1.1. Yên Pexşankî

##### 1.2.1.2. Yên Helbestkî

1.2.2.Zûgotinokên Li Nav Çîrokan

1.2.3.Zûgotinokên Li Dawiya Çîrokan

1.2.3.1. Yên Pexşankî

1.2.3.2. Yên Helbestkî

1.2.4. Zûgotinokên Di Teşeyê Çîrokê De

1.3. Zûgotinokên Fablan

2.Zûgotinokên Li Ser Meh û Demsal û Gerestêrkan

2.1. Zûgotinokên Li Ser Mehan

2.2. Zûgotinokên Li Ser Demsalan

2.3. Zûgotinokên Li Ser Gerestêrkan

3.Zûgotinokên Rojên Taybet

4.Zûgotinokên Lîstikan

4.1.Zûgotinokên Ku Bi Lîstina Peyvan Çêdibin

4.2. Zûgotinokên Bizar û Heqaret û Biçûkxistinê

4.3.Zûgotinokên Ku Ji Bo Şabûnê, Xweşwextderbaskirinê Tê Gotin

4.4.Zûgotinokên Dua û Daxwazan

4.5.Zûgotinokên Bi Bandora Perwerdeyê Çêbûne

### **1.3. CUREYÊN ZÛGOTINOKÊN KURDÎ**

**1.3.1. Zûgotinokên Girêdayî Cureyên Edebiyata Gelêrî**

**1.3.1.1. Zûgotinokên Mamikan**

Di vî cureyê zûgotinokê de, zûgotinok û mamik tevlihev in. Mamik bi alîterasyon û lîstika peyvan ava dibe, wek teşe di forma zûgotinokê de ye lê di



dawîyê de pirs heye û peywira mamikê digire ser xwe. Li vir mamik bi lezgînê tê gotin û ya muhîm ew e yê li hember tê bigihêje. Di warê gotinê de kesê dibêje jî divê hosteyê gotinê be ku karibe zûgotinokê zû bêje ku yê li hember zû bi zû nikaribe fehm bike ka çi dibêje.

141. Tişt in mişt in,  
Sernivîşt in,  
Baran barî xwe guviştin? (Çûk)

Di vê mînakê de hem bi dengê “ş”yê alîterasyon hatiye kirin hem jî “îşt” wek qafiye hatiye bikaranîn. An jî ev mînaka ku zûgotinok-mamik tevlihev in dê vê yekê xurt bike (Subaşı, 2014, s. 26).

181. Çil derzî,  
Çil û çar derzî,  
Qula derziyê de bezî? (Ta)

Her wiha zûgotinokên hejmara wan 198, 200, 201, 202, 203, 204, 205, 206, 207, 208 in dikevin bin banê vî cureyî.

### 1.3.1.2. Zûgotinokên Çîrokan

Zûgotinokên çîrokan ew gotinên qalibîne ku carinan li serê çîrokê, carinan li nava çîrokê û carinan jî li dawiya çîrokê tînin gotin (Boratav, 2015, s. 86). Zûgotinokên serê çîrokan bi gotinên qalibî carinan kin carinan dirêj, berî ku guhdêran bike xeyn û xeyalan agahî dide. Zûgotinokên nav çîrokan derbaskirina demên dûr û dirêj û meknan bi hevdu ve girê dide. Carinan jî ji bo rihetkirina guhdêran hêmanên pêkenokan lê zêde dibe. Zûgotinokên dawiya çîrokan, di dawiya çîrokan de bi awayekî surrealîst, bi gotinên qalibî dawî li çîrokê tîne û mijarê digihîjîne encamekî (Boratav, 2000, s. 9).

Di zûgotinokên çîrokan de bandora çîrokbêjan zêde ye. Çîrokbêj li gor dilê xwe van gotinên qalibî bi kar tîne. Li gor dilê xwe, li gor civatê carinan gotinên

qalibî, dûr û dirêj bi kar tîne carinan jî kurt dibire. Di vir de hinekî hunera çîrokbêjan jî dikeve dewrê.

Zûgotinokên çîrokan her çiqas ji gotinên qalibî pêk hatibin jî gelek cureyên wan hene. Pertev Naîlîl Boratav li ser varyantên zûgotinokên çîrokan sekiniye. Her cureyê wek tîp senifandiye û di bin wan tîpan de jî versiyonê wan rêz kiriye.

Di kurdî de jî em rastî gelek zûgotinokên çîrokan û varyantên wan hatin. Ev zûgotinok bi heman qalibî dest pê dikin, li gor bikaranîna xwe kin an jî dirêj dibin. Carinan ev gotinên qalibî wisa dirêj dibin ku bi qasî rûpelekî dirêj dibin, carina jî bi tenê bi çend peyvan hevokek pêk tê.

Li gor çavdêriyên me yên ku di serê çîrokê de tîp gotin peywira wan balkişandina ser çîrokê ye. Armanca gotina wan ew e ku guhdêran ji bo çîrokê amade bikin. Yên ku di nav çîrokan de tîp gotin, peywira wan domandina çîrokê ye û pêkanîna herikbariya çîrokê ye. Peywira zûgotinokên dawîya çîrokê jî bidawîanîna çîrokê ye. Dawîanîna çîrokê, piranî li gor dilê însanan pêk tê û dixwazin lehengê di dawî de bigihijînin meqsed û miradan.

Pertev Naîlî Boratav zûgotinokên çîrokan dike çar beş:

1. Gotinên Qalibî Yên Destpêkê
2. Serpêhatiyê Kurt yên Di Teşeyê Zûgotinokên Serê Çîrokan de
3. Zûgotinokên Wek Çîrok
4. Zûgotinokên Dawî û Nav Çîrokan

Me li çîrokên kurdî yên ku hatine berhevkerin 12 pîrtûkan û nêzî sed çîrokan nihêrt û me ev cure peyda kirin me dubare nenivîsî peyvek jî cuda be me ew jî nivîsî.

- 3.1.1 Zûgotinokên serê çîrokan
- 3.1.2. Zûgotinokên nav çîrokan

3.1.3. Zûgotinokên dawiya çîrokan

3.1.4. Çîrokên wek zûgotinok

### **1.3.1.2.1. Zûgotinokên Serê Çîrokan**

Meriv dikare ji bo zûgotinokên çîrokan bêje xemla çîrokan e. Zûgotinokên çîrokan dema di serê çîrokan de tîstên gotin, peywira destpêkê digirin ser xwe. Ew guhdêran agahdar dikin ku tiştên tîstên qalkirin, ji xewn û xeyalan pêk tîstên. Hebûn an jî tunebûna bûyerên tîstên qalkirin, nayê îsbatkirin û bi zûgotinokê diyar dibe ku dema pêkhatina bûyerê ne diyar e. Mesela bi “Hebû tune bû...” yê peyama nebûn an jî nerastbûna çîrokê, bi “Carek ji caran...” ê peyama xeyalîbûna mekan û zemanê dide. Hin zûgotinokên serê çîrokan jî helbestkî ne, armanca bikaranîna wan jî balkişandina guhdêran e. Dema meriv berê xwe dide van zûgotinokan, tîstên ku di nav xwe de çîrokên biçûk û serbixwe dihewînin.

Ji zûgotinokên ku di serê çîrokan de tîstên gotin me ev cure bi dest xistin:

#### **1.3.1.2.1.1. Zûgotinokên Serê Çîrokan Yên Pexşankî**

##### **1.3.1.2.1.1.1. Zûgotinokên Serê Çîrokan Yên Pexşankî Yên Ku Bi “Carek Ji Caran” Dest Pê Dikin**

283. Carek ji caran rehme li dê û bavên xwendevan û guhdaran. Ji xeynê cendirme û tehsîldaran. Hebû nebû tu kes û tu tişt ji xwedê mezintir nebû. herwisa tu kes ji rovî fêlbaztir û ji hirçê bêaqiltir nebû...

225. Carek li caran, rehmet li hazir û guhdaran, xêncî yê qulê dîwaran. ‘El’ele rahî, guneh li sikura şeytên be. Berê sal û zeman bû, niha bûye zar û ziman. Ez serê te neêşînim, serê dijminê te biêşînim. Baqek gul û sosin, binevş û nergiz, rihan û beybûn, çiçek û pêçekan li ber serê te da biçikînim, pê xem û xiyalên dilê te birevînim

284. Carek ji caran, rehmet li dê û bavê zehmetkêş û xwendevanan...

209. Carek ji caran rehme li dê û bavê guhdaran...

210. Carek hebû ji caran, rehme li dê û bavê guhdaran...

211. Carek ji caran rehme li dê û bavê guhdaran, nelet li şeytanê ber dîwaran.  
Hebû nebû ji xwedê meztir kes nehebû...

#### **1.3.1.2.1.1.2. Zûgotinokên Serê Çîrokan Yên Pexşankî Yên Ku Bi “Hebû Tunebû” Dest Pê Dikin**

212. Çi hebû çi tunebû...

213. Hebû tunebû, rehme li dê û bavê min û we bû. Hebû gundek ji gundan,  
gundekî ava, gundekî bi xêr u bêr...

214. Hebû nebû ji Xwedê û Pêxember mestir ti kes tunebû...

219. Hebû tunebû..., roj roja diçe, meh meha diçe, sal sala diçe...

Her wiha zûgotinokên hejmara wan 215, 216, 217, 218, 220, 221, 222, 223, 224, 226 in dikevin bin banê vî cureyî.

#### **1.3.1.2.1.1.2. Zûgotinokên Serê Çîrokan Yên Helbestkî**

227. Carekî cebarekî

Kosî bazda serd darekî

Dar hejiya kosî vejîya

Kosî ket herdû çavên wî derket.

228. Carekê, cebarekê,

Kûsî rabû sere darekê,

Dar hejiya, kûsî meşîya,

Cotikê çevê wî rijya.

229. Çirokê çîvanokê

Xetxetokê bajarokê

Gongolokê şivanokê.

### 1.3.1.2.2. Zûgotinokên Nav Çîrokan

Armanca van zûgotinokan di nav bûyeran de têkilî çêke û herikbariyê bide çîrokan. Zûgotinokên nav çîrokan bipiranî di nav çîrokên kin û di pêkenokan de hatin peydakirin ev cureya bi piranî di nav çîrokan de wekî dîalog derbas dibin. Dawîbûna çîrokan jî dîsa bi diyalogê diqede.

230. Mêvanê Ku Naçe:

Mirovek bi mêvanî çûye mala dostekî xwe. rojek, du roj sê roj, hefteyek, deh roj... mevanî lê xweş hatiye û xwe ji cîyê xwe nelivandiye. Mazûvanên wî jî jê kerixîne û bêzar bûne. lê belê ji ber toreyên mavanîyê, ji mêvanê xwe re negotine:

“Rabe here mala xwe”

Rojekê malxoyê malê pisîka xwe girtiye daye ser çoka xwe serê wê û pişta wê maliştine û jê ra weha gotiye:

Pişê pişê çav mişmişê

Mêvan rojek, didu, sisê

Mêvan mexseda mazûvanê xwe fêm kiriye. qasek paşê pisîk ji ser çoka xwedîyê xwe daketiye. vêca mêvan ew daye ser çoka xwe, bi destê xwe serê wê pişta wê maliştine û jê ra weha gotiye:

Pişê pişê,

Çav xezalê

Pir xweşik,

Gula malê

Mêvan naçe heta dortira salê.

Çîroka navdar şengê û pengê de jî derbas dibe lê ji ber ku çîrok dirêj  
e em ê tenê başa zûgotinokê bidin:

231. Şenga min Penga min

Dayik çûye zozanan

Xwariye pelên kizwanan

Şîr ketiye guhanan

Zû bikin, derî vekin

Dayik hatiye danan

Çîroka kurê mîrî û beq de jî dîsa wek dîalog derbas dibin:

232. Kurê Mîrî û Beq:

Kurê mîrî rojekê diçe ser kaniyê ku avê vexwe, beqekê li ser kaniyê dibîne,  
bidîtina beqê re jî evîndarê çavên beqê dibe. Ji wê rojê û bi şûnde kurê mîrî rojê  
carekê diçe ser kaniyê û gazî wê dike, û dibêje:

Beq belîs were lîs

Kurikê mîran çav ramîs

Beq tê, diçe ser çoka wî, bi beqê re têr û tije dileyîze û pê şa dibe. Beqê ber  
dide û diçe malê. Ev demekê wisa didome, jina wî jê dikeve şikê dibêje: “Ev rojê  
carekê diçe ser kaniyê çî? “Rojekê jina wî dide pey, xwe lê datîne ku mîrê wê wa  
ye wisa dike, jinik dibêje: “Wellehî mîrê min evîndarê çavên beqê bûye.” Ew jî  
diçe malê şûjinê tîne, sor dike û gazî beqê dike:

Beq belîs were lîs

Kurikên mîran çav ramîs.

Beq tê, diçe ser çoka wê, ew jî şûjina ku sor kiriye di çavê beqê re dike, beqê ber dide û diçe malê. Dîsa roja din kurê mîrî di wexta xwe de tê gazî beqê dike dibêje:

Beq belîs were lîs

Kurikên mîran çav ramîs.

Beq dibêje:

Ne têmo neqeto

Jinika te ya qehpeto

Çavê min kir şeweto (herem farqîn/amed)

233. Bet û Qaz û Ker

Hebû tunebû, ji Xwedê mestir kesek tunebû. Betek, qazek û kerek hebû. Ev her sê dibin hevalê hev û bi hev re şîrkatî dikin. Li gor şîrkatîya xwe bi hev re genim diçînin. Bihar tê û genime wan şîn dibe. Ji hev bi dizî genimê xwe dixwin. Piştî wê ew dibêje te xwariye, ya din dibêje te xwariye, û bi vî awayî hev dû sûcdar dikin. Dibêjin em biçin ba melle, şirrete. Radibin diçin ba melle, şîrîetê. Meseleya xwe ji melle re dibêjin. Melle ji wan re dibêje, "Biçin ser pirê, sond bixwin û bifirin. Kî derbas bibe û nekeve avê û li nav rê deyne, wê nexwariye." Her sê didin pey hev û diçin ser pirê. Pêşî bet sond dixwe:

Bet û bet ela beteytî

Bet û bet kakl û Kurbeytî

Bet û bet xews û madella

Kê genime pişta pirê xwariye xenîm û elaaa!"

Û piştî sondê dibêje pirrr û difire û diçe li nav rê datîne.

Dû re qaz sond dixwe:

Qaz û qaz ela qazeytî

Qaz û qaz kakl û Kurbeytî

Qaz û qaz xews û madella

Kê genime pişta pirê xwariye xenîm û elaaa!

Û qaz jî dibêje pirrr û difire û diçe li nav rê datîne. Dor tê ser kerê û îca jî ew sond dixwe:

Zir û zir ela zireytî

Zir û zir kakl û Kurbeytî

Zir û zir xews û madella

Kê genime pişta pirê xwariye xenîm û elaaa!

Piştî sondê ker xwe di pirê de davêje û dikeve nav avê û dicihime. Çîroka min li diyara, rehme li dê û bavê hazir û godara, xeynî şey tanê korê pist dîwara.

### **1.3.1.2.1.3. Zûgotinokên Li Dawiya Çîrokan**

Armanca gotina zûgotinokên dawiya çîrokan bidawîanîna çîrokê ye. Çîrok li gor daxwaza civatê bi erênî bi encam dibe. Zûgotinokên dawiya çîrokan jî bi gotinên qalibî bi awayê pexşankî an jî helbestkî diqede. Yên helbestkî wek diyalog in û berdewama zûgotinokên nav çîrokan in.

Zûgotinokên ku di dawîya çîrokan de tên gotin du cure ne herdu jî ji bo dawî anîna çîrokê tên gotin, cureyek bi awayê pexşankî ye û yê din jî bi awayê helbestkî ye.

#### **1.3.1.2.1.3.1. Zûgotinokên Li Dawiya Çîrokan Yên Pexşankî:**

234. ... Û rehme li dê û babê hazir û godara.

235. ... Çîroka me çû dîwaran, rehme li dê û bavê xwendevan û guhdaran.



236. ... Çîroka min ji we re xweş, ka telaşek şebeş.

237. ... Çîrok çû bin devîyan, rehme li dê û bavê me hemûyan

Her wiha zûgotinokên hejmara wan 238, 239, 240, 241, 242, 243, 244 in dikevin bin banê vî cureyî.

### 1.3.1.2.1.3.2. Zûgotinokên Li Dawiya Çîrokan Yên Helbestkî

245. Çûk Ê Pîrê:

– Tû tû tû tû! Min çixna lingê xwe da bi heft nanan.

– Tû tû tû! Min heft nan da bi heft beranan.

– Tû tû tû! Min heft beranan da bi bûkekê.

– Tû tû tû! Min bûkek da bi bilûrekê.

– Tû tû tû! Tû tirû tûtû, tû tirû tû tû...

246. Kurê Mîrî û Beq:

Kurê Mîr dibêje:

Beq belîs were lîs

Kurikên mîran çav ramîs.

Beq dibêje:

Ne têmo neqeto

Jinika te ya qehpeto

Çavê min kir şeweto

247. Hirça Bextreş:

Kuro evdo Mêrik!

Ma sibê tu dê neyî ser erdik?

Ez ê te bikim k...r û gunik .

248. Du Brayên Sêwî:

Kê kuşt?

Min kuşt.

Kê şuşt?

Min şuşt.

249. Kekû:

Kekû kekû

Kamî kişt?

Min kişt, to kişt

Kerda kolanî kişt!

Dêla damarî kişt!

Kekû, kekû

Kamî kişt?

Min kişt

Kamî şit?

Min şit

250. Hoste Nekar:

Hoste nekar,

Razê wek her car

Risqê sibê li Elahê Cebar.

### 1.3.1.3. Zûgotinokên Pêkenokî

Alî Duymaz behsa zûgotinokên pêkenokî dike (Duymaz, 2002, s. 279). Dema meriv berê xwe didê, di kurdî de jî, di vê cureyê de pêkenokên ku me bi dest xistin, çîrokên biçûk, bi awayên qerfî û di teşeyê zûgotinokê de tên gotin. Ev zûgotinok bi armanca kenandinê tên gotin. Ji xwe M.Emîn Borzarslan jî ev cure xistiye nav cureyên pêkenokan. Ji ber vê yekê jî me wek pêkenok nirxand û wek zûgotinokên pêkenokî bi nav kir.

#### 251. Çend Mêr Kirine?

Mirovek ji diya xwe ya pîr û jinebî pirsîye ku çend mêr kirine. Jinikê wek hozanekê, bi helbestkî bersiv daye û weha gotiye:

Şeş û şeş, şeşekî dî

Du mela û şêxekî dî

Bavê te yê rehmetî

Du kesên dî

De lawo, destê mi bi hevîr e

Bi xwedê mi hew di bîr e.

Ji bo vê mînakê Bozarslan gotiye çîrokên helbestkî, Pertev Naili Boratav jî di pirtûka xwe ya Tekerlemeyê de heman çîrokê bi varyanta tirkî daye û ji bo vê wek çîvanokên serê çîrokan gotiye.

Dema em li van varyantan dinêrin teşeyê vegotinê û naveroka wan yek e, Bozarslan wek cure jê re gotiye helbestkî/strankî ne. Boratav jî gotiye zûgotinokên serê çîrokan. Dibe ku di tirkî de di serê çîrokan de bînan bikaranîn lê di kurdî de ev wek pêkenok tînan bikaranîn ku Bozarslan jî kiriye nav beşa pêkenokan.

#### 252. Hebû qirşikek kêzikek û tertikek,

Ba hat qirşik firiya

Baran hat tertik hiliya

Hingê kêzê keniya rovî tirtika wê qetiya.

253. Hebû tunebû bûkek hebû..

Rojek ji rojan, carek ji caran bû..

Navê wê bûkê Zexê bû..

Heya ku savarê me hebû

Zexê bûka me bû..

Piştî ku savarê me xilas bû..

Zexê çirtek da xwe ji me derbas bû!

#### 1.3.1.4. Zûgotinokên Fablan

Fabl cureyekî çîrokan e ku bi forma helbestê hatine ristin. Di fablê de bi piranî ajal û giya dipeyîvin lê lehengên fablan zêdetir ajal in. Ajal wek însanan dipeyîvin û wek wan hereket dikin.

Zûgotinokên fablan jî cureyekî zûgotinokan e ku bi armanca bilindkirina kêf û coşa guhdaran tên gotin. Ev zûgotinok ji peyvên biwate û yên bêwate tên û xwe dispêrin dinyaya xeyalan. Zûgotinok û çîrok di nav hev de ne û menzûm in. Armanca bikaranîna van zûgotinokan ew e ku zûgotinok nehêle bala guhdêran ji ser çîrokê here, coş û kelecana çîrokê kême nebe.

257. Rovî û Pîrê

Bizê bizê şîr şîr

Pîrê Pîrê

Dûvlaşîkê min bida

Ez harim bi şerike bavê xwe da

Devî devî çûlo çûlo

Bizê bizê, şîr şîr,

Pîrê pîrê

Dûvlaçikê min bida

Ez harim bi şerikê bavê xwe da

Hedad hedad dasê dasê

Devî devî, çûlo çûlo

Dûvlaçikê min bida

Ez harim bi şerikê bavê xwe da

Tutu tutu kaka kaka

Hedad hedad, dasê dasê

Devî devî, çûlo çûlo

Dûvlaçikê min bida

Ez harim bi şerikê bavê xwe da

Kûvar kûvar qût qût

Tûtû tûtû kaka kaka

Hedad hedad, dasê dasê

Devî devî çûlo çûlo

Dûvlaçikê min bida

Ez harim bi şerikê bavê xwe da

Tibvê tibvê, kixê kix e

Kûvar kûvar qût qût

Tutu tutu kaka kaka

Hedad hedad dasê dasê

Devî devî çûlo çûlo

Dûvlaşikê min bida

Ez harim bi şerikê bavê xwe da

Kadîn kadîn, ka ka

Tibvê tibvê, kixê kix e

Kûvar kûvar, qût qût

Tûtû tûtû, kaka kaka

Hedad, dasê dasê

Devî devî çûlo çûlo

Dûvlaşikê min bida

Ez harim bi şerikê bavê xwe da

258. Kurê Tozlî Paşa:

Huseyn:

Qey mir ew roviyê ku dihatin loşa

Bi çaqê bigir bavêj nav telaş û melaşan

Rovî got:

Herê Huseynê ber heft aşan

Min tu kir xwediyê kurk û qumaşan

Min tu kir zavayê mîr û paşan

Ez mirime îro bûm roviyê çikal û loşan

Bi çaqa min digirin win davêjin nav telaş melaşan

### **1.3.2. Zûgotinokên Li Ser Meh û Demsal û Gerestêrkan**

#### **1.3.2.1. Zûgotinokên Li Ser Mehan**

##### **1.3.2.1.1. Ji bo Sibatê:**

285. Sibatê gotiye:

Ey xwîşka ‘Edar

Bide min bide min rojê xidar

Ez dûv li gîskê bikim dar

Di sergoyê rabikim xwar

Sibat sibatî

Gul û giya ribitî

##### **1.3.2.1.2. Ji bo Sibata, Adar, Nîsan û Gulanê**

259. Sibata dînik

Sibata tiroviro

‘Edara sî û du ro

Nîsan a me ye

Gulan textirme ye

### 1.3.2.1.3. Ji bo Adarê

260. Huvdeyê ‘edarê

Berfê da guliya darê

Nema heta êvarê

Huvdeyê ‘edarê

Melaîket hatin xwarê

Hey kirine buwarê

‘Edar e

Sibê sar e

Nîvroyê

Se xwe davêje siya dîware

‘Edar e

Dew li dar e

Ne li va ye

Deng li Meşkenî û ‘Embar e

Li mala kotî û çav nebar e

‘Edar e

Mehkî sar e

Ne ziftan e

Ne biwar e

Şeşê ‘edarê



Tê denge kare

Gulana rengîn

Gulan da ço

Bê gîdiş naço

#### **1.3.2.1.4. Sebat û Adar**

Ku sebat diqede dikeve adarê, adar du roj û danekî (sê) rojê xwe bi deyn dide sebatê. Sebat dibêje:

261. Xwişka adar, ha xwişka adar,  
Tu bide du roj û danekî xedar,  
Ez ê piyê gîsko di sergo da hikim xwar.

262. Xweha min î adarê,  
Bide min sê rojê xedarê,  
Ez gîskê pîrê ji tehtê bînim xwarê.

263. Xaleta adar,  
Bide min du roj xedar,  
E gîska girro serê sergo de bikim xwar.

#### **1.3.2.2. Zûgotinokên Li ser Demsalan**

##### **1.3.2.2.1. Derheqê Havînê de**

264. Havîn e  
Dewî şîn e  
Bizin xem nîn e

#### 1.3.2.2.2. Derheqê Zivistanê de

265. Hay li min hay

Bi şev hewr û bi roj say

Min li riyê bavê wî nekesi gayî

Kaya wî di kadînê da mayî

Neda çêleka mina zayî

#### 1.3.2.2.3. Derheqê Veguhestina Demsalan

266. Sêzdehê Hezîranê

Roj zivirî ziftanê

Sêzdeyê Kanûna

Li ba ket gul û leymûna

#### 1.3.2.3. Zûgotinokên Li Ser Gerestêrkan

267. Pêl û Mêzîn çûn ava

‘Ecêb dinya neket ser ava

Qurixê havêtin

Agir bi dinyayê nexistin

#### 1.3.3. Zûgotinokên Rojên Taybet

Ev cure di rojên taybet de; sersal, newroz, serhivde, serê gulanê, ... û hwd tên gotin, bi piranî di bûyerên xwezayî de derdikevin holê.

Zarok dema bûka baranê digerinîn wiha dibêjin:

268. Bûka me baran dixwaze,

Golikê me giya dixwaze,

Kalikê me dua dixwaze,

Ji bo serê salê zarok mal bi mal digerin û dibêjin:

269. Serê salê binê salê

Tozkî bavê binê çalê

Tu qurbana gunikê kalê

Her wiha zûgotinokên hejmara wan 270, 271, 272, 273, 274, 275, 276, 186 in dikevin bin banê vî cureyî.



## BEŞA DUYAN

### 2.1. ZÛGOTINOKÊN LÎSTIKÊN ZAROKAN

Zûgotinokên lîstikan ew zûgotinok in ku ji bo hilbijartina kesên nava lîstikê, gazîkirina kesan ji bo lîstikê, hêskirina kes/kesên nava lîstikê û biçûkxistina kesên nav lîstikê tê gotin ku lîstik geş bibe (Yayın, 2009, s. 5). Ev zûgotinokên nav lîstikan de tînin gotin carinan bê wate carinan bi wate ne û mijareke wan a diyar nînin e. Peyvên navê, carinan wek peyvên heyî û bi wate, carinan jî wek peyvên ji hêla zarokan ve hatine çêkirin û bêwate derdikevin pêşberî me. Hans Zullinger, ji bo vê yekê dibêje ku peyvên bi wate aliyê lîstikê yê girêdayî rastiye, yê bê wate û çêkirî dinyaya zarokan ya xeyalî nîşan dide (Zullinger, 1997).

Ev cureyê zûgotinokan bi piranî ne girêdayî cureyekî edebiyata gelêrîne û bi temamî menzûm in. Zêdetir berhemên afrîneriya zarokan in. Dibe carinan ev afrînerî bingeha xwe ji afrîneriya mezinan bigire lê zarok dema berhema xwe diafirîne, berhemê bi temamî li ser esasê afrîneriya xwe ava dike (Boratav, 2015, s. 156).

Hinek lîstik seranser ji zûgotinokê pêk tînin. Ev cure zûgotinok li gorî rîtmekê tînin gotin û bi liv û tevgerên organa û bi îfadeyên rû tînin destekirin. Carinan jî zûgotinok, ji bo îcrakirina lîstikê xurt bike tînin gotin.

#### 2.1.1. Fonksiyonên Zûgotinokên Lîstikan

Di vê mijarê de xebatên herî berfireh Pertev Naîlî Boratav û jî Alî Duymaz kirine ji ber vê em ji xebata wan sûdê wergirin.

##### 1. Zûgotinokên Lîstikên Zarokan

- a. Zûgotinokên ji bo Gazîkirina Lîstikê
- b. Zûgotinokên ji bo Hilbijartina Pîrikê
- c. Zûgotinokên Nava Lîstikê
- d. Zûgotinokên Dawiya Lîstikê

Fonksiyonên Zûgotinokên lîstikan em dikarin bêjin ku hinek ji wan di lîstikê de ji bo neqandinê hinek ji wan ji bo hilbijartinê hinek ji wan ji bo xweş wexta derbaskirinê, hinek ji wan ji henek kirinê, hinek ji wan ji heqaret û piçûk xistinê hatine bikaranîn. Hinek ji wan xwedî du û sê fonksiyonan in. Hinek zûgotinokên nav çîrokan, wek yê lîstikan hatine bikaranîn. Hinek zûgotinok hem ji bo neqandinê hem jî ji bo hilbijartinê hatine bikaranîn, heman zûgotinok bi fonksiyonek, du fonksiyon an jî sê fonksiyonan derketin hemberî me. Bi piranî fonksiyona zûgotinokan di hevokên dawî de zelal dibe di kîjan civakî de û ji bo çi hatiye gotin tê fêmkirin.

## 2.1.2. Cureyên Zûgotinokên Lîstikan

### 2.1.2.1. Zûgotinokên Ji Bo Neqandin An Jî Hilbijartinê Tê Gotin

Zarok beriya ku dest bi lîstikê bikin di navbera xwe de pîrikekê hildijbêrin. Ev pîrik bi alikariya zûgotinokê ku meriv dikare bêje ev awayekî peşkê ye, tê hilbijartin. Di van zûgotinokan de hejmar, li kêleka hejmarê jî peyv an jî kîteyên biwate û bêwate tên bikaranîn û li gor ahengekê tên gotin. Ev zûgotinok bi awayê menzûm in û bi piranî xwedî serwa ne. Ji bo neqandina kesên nav lîstikê an jî diyarkirina tîmên lîstikê jî heman terz tê bikaranîn. Di kurmancî de em rastî navekî taybet ê serbixwe yê vî cureyî nehatin.

1. Yekî teter  
Yekî çû jor  
Hat ser te dor.
2. Yek didoke du masî  
Şemso Qûto rûbasî  
Hinno dîno faris  
Doraya te ye tu kus.
4. Mir Mir Berweste  
Mir mir berweste,  
Nanê xalê xwe dipêjim,

Ava gula dirêjim,

Ya şewiti tavêjim.

Her wiha zûgotinokên bi hejmarên 3,5,6,7,8, 9, 10, 11, 12, 13, 14, 15, 16, 17, 18, 19, 20, 21, 22, 23, 24, 25, 26, 27, 28 û 29an dikevin bin banê vî cureyî.

### **2.1.2.2. Zûgotinokên Ku Di Nava Lîstikan De Tê Gotin**

Wekî ku me berê jî anîbû zimên, di lîstikê de rolên girîng yê zûgotinokê hene. Zûgotinok lîstikê geş dike, coşa lîstikê zêde dike, îcrakirina lîstikê hêsan dike û rê dide pêşîya lîstikvanan. Zûgotinokên nava lîstikan jî bi piranî menzûm in û li gor ahengekê tê gotin. Carinan wek diyalog, carinan wek helbest; carinan yek parçe carinan jî wek sê û çar parçe di nava lîstikê de tê gotin. Ji ber vê yekê, ji bo ku ev cureyê zûgotinokê baş bê fehm kirin em ê zûgotinokê, tevî lîstikê bidin. Çîmkî di vî cureyî de dema zûgotinok ji lîstikê diqete rola zûgotinokê tam nayê fehmkirin. Armanca vî cureyê zûgotinokê ew e ku zûgotinok lîstik rengîntir bike, balê bikişîne ser lîstikê, bala lîstikvanên lîstikê zindî bigire û coşa lîstikê zêde bike. Di vî cureyî de senaryoya lîstikê diyar e bi zûgotinokan lîstik dewlemend dibe û dikeve nav rê û rêzikekê.

30. Hêklo mêklo

Çalim çêklo,

Hestiyê kewê

Li ber kewê

Kewê firî

Mamo gurî,

Hat ser vir da rî/danî...

Ev lîstik bi pêçiyên tê lîstin, zarok tev destê xwe datînin û pêçiyên wan bi peyvan tê hejmartin û peyva dawî li ser kîjan pêçiyê bisekine ew kes wê pêçiya xwe

qat dike, ev yek dîsa dubare dike û yê ku ewil pêçiyên wî hemî tên qatkirin ew ji lîstikê derdikeve û yên mayî dewam dikin dîsa yê ku pêçiyên wî / wê hemî bên qatkirin ew ji lîstikê derdikeve û ev tişt heta kes biqedin dewam dike yê kudimîne dawiyê bi ser dikeve.

Ji lîstina lîstikê jî xuya dike, li vir zûgotinokê, peywira hejmaran girtiye ser xwe û ji serê lîstikê heta dawiya lîstikê hatiye bikaranîn ango meriv dikare bêje lîstik li ser zûgotinokê avabûye.

31. Hopanê, mopanê,

Kêziya minî panî,

Avêt golanî,

Golanî qamiş e,

Kekê min çawîş e,

Çawîşê biçûk e,

Jê re anîn bûk e,

Bûk bûka Hesên Beg e,

Sêla ser kulek e,

Çûm qûnceke tarî,

Kewek tê de dinalî,

Min go kewê çî hal û hewalê te ye,

Go per û baskên min şikestî ye,

Qefla li ser derî ye.

Lîstikvan mîna çemberekê rêz dibin û herdu destên xwe datînin erdê. Lîstikvanek destekî xwe bilind dike û peyveke qinika “Hopanî” dibêje, paşê destê

xwe datîne. Ya li kêleka wê jî peyva duyemîn ya qinikê dibêje û pê re jî destê xwe bilindike û datîne... Bi vî qayîdî peyva paşî ya qinikê li ser destê kê bimîne, ew wî destê xwe dike paşîla xwe. Her du destên kê, bi vî qayidî bikeve paşilê, ew ji cezayê rizgar dibe. Lê belê her du destên wê heta paşîya lîstikê di paşilê de dimîne. Yek caran lîstikvan jê dipirsin: “Sêv sor bûne?” Ew jî dibêje: “Na!”

Ya li paşiyê bimîne, jê re dibêjin “Bîn ji te tê” û wê ji lîstikê derdixin.

32. Çivê çivê dev reqis

Didim te nanê garis.

Ev lîstik jî bi du pêçiyar çermê ser destê zarok tê girtin û tê gotin. Bi zarokên biçûk (2-4salî) re tê lîstin.

33. Gurzo Gurzo Gurzo gurzo

Ka gurzê vira?

Çêlekê xwariye

Gurzo gurzo ka çêlek?

Me şerjê kiriye

Gurzo gurzo ka goştê pamiş?

Mişkê xwariye

Pişt pişt pişt

Ev lîstik herî kêma bi du-sê kasan tê lîstin, zarok kulm çêdikin kesê ku dipirse kulma xwe datîne erdê, yê ku bersiv dide kulma xwe dide ser kulma din bi vî awayê devam dike.



34. Sê û sê û sê rêze

Kuro bîjo heramze

Here binê darê

Zivir were ve(vir)

Heke nebû bîst û çar

Serê min jî bike dar.

Ev jî bi tizbîyê tê lîstin, kesek tizbîyê dide pişt xwe û van gotinan dibêje û morîkan dikişîne, dema ev gotin xilas dibin tizbîyê tîne li huzûra kesên din dijmêre, divê 24 morîk kişandibe.

35. Êkan e

Dabiskan e

Xana çepê

Çepil mizê

Ara gîzê

Tote hînê

Serkêşînê

Hilkêşînê

Ev jî zivistanê zarok li ber tenûrê rûdinên û lingê xwe dirêj dikin, bi vê zûgotinokê bi dorê lingê xwe hildikişînin.

Zarok destê xwe didin ser milên hev, li kuçe û kolanan diçin û tîn û wiha dibêjin:

36. Heval hevaloşkê

Nan û penîroşkê

Hevalê min şivan e

Gopalê wî pan e

Ji bo guran derman e.

Kerika kerajo, kê te dajo: Zarok çavê yekê girê didin û wî didin pêş, zarok li pişt kesê/a ku çavê xwe girtiye disekinin yê/a ku li pišta yê / ya ku çavê xwe girtiye pêçiya xwe dukte pišta wî / wê û dibêje:

37. Kerika kerajo

Kê te dajo,

Divê kesê ku destê xwe kuta ye pišta wî/ê texmîn ke, heke zanibe, dor tê ser yê/a li pişt.

38. Pîr pitik, şaşa qitik :

Di lîstika çavgirtonekê de pîrikê dixin nava xwe û dema lê didin dibêjin:

Pîr pitik

Şaşa qitik.

39. Ooooo

Êkê Mêkê

Qirika çûkê

Şah bilbil

Textê çilê

Çil çîzanê

Ava rengê hezareyê

Gur gureyê

Bîst li teyê

Xwe veşêrin, va hatim we!

Dema ku pîra hilokê çavê xwe digire vê zûgotinokê dibêje.

Hin cure jî ji bo qîdik anînê tên gotin, zarok dirêj dikin û ji pîyê wî/wê destpê dikin û zûgotinok tên gotin bi pêçiyar li ser laşê zaroka digere heta paşlê di paşlê de qîdik tînin.

40.

Pişo virda

Pişo wê da

Min şîrqamek

Li qûnê da

Pişo vaye paşla (navê zarok).... da.

41. Mişko mişko

Neyarê nanê hişko

Nanê hişk di kur de ye

Mişko bixwo

46. Mamê Mûs:

Ev lîstik li malê tê lîstin. Lîstik bi du kesan tê lîstin.Çavê herdu lîstikvanan tê girêdan.Di destê herduyan de qamçî,her yek bi seriyekê balîfê digire û vê gotinê dibêjin:

Kesê yekê: Mamê Mûs!

Kesê duyan: Lebê Hûs!

Kesê yekê: Bê te derbika bênamûs?

Kesê duyan: Bira bê.

Kesê yekem qamçiyekê davêje kesê duyem.Qamçî li yê din bikeve nekeve jî dor tê kesê duyem.Lîstik bi vî hawî dewam dike û temaşevan pê dikenin.

47. Bûtî Bûtî:

Lîstikvan berhev dibin û bi peşkê lîstikvanê ewil tê hilbijartin.Ev lîstikvan bi zûgotinokê ajalekê dide nasîn :

Bûtî bûtî bût kutirmircan

Ser mircan bût kutirmircan

Nîg mircan bût kutirmircan

Dûv mircan bût kutirmircan

Çav mircan bût kutirmircan

Go mircan bût kutirmircan

Dev mircan bût kutirmircan

Piştî ku ajal hate nasandin lîstikvanên din bi destê xwe serê qamçiyê di destê lîstikvanê pirs pirsîye de tesele dikin û ajalekê texmîn dikin û navê wî dibêjin. Kesê qamçî di destê de qamçî dide kesê ku tê derxe ew ajala nasandî kîjan e û dibêje: Ha jî te re qamçî li nava van ajalan bikeve. Ew kes jî qamçî hildide bi nava lîstikvanan dikeve kî bikeve destê wî lê dide.

48. Hêtê Mêtê:

Demên berê piştî ku diketin nav nivînan dihate lîstin. Lîstik bi vê zûgotinokê dest pê dike:

Hêtê Mêtê

Mala me li ber pirê tê

Tajîkî ji wê da tê

Tevû xililê tê

Jê tê

Yek vê zûgotinokê dibêje û piştî vê zûgotinokê li gor zayend û hejmarê malbatekê dide nasandin û ji yên din tê xwestin ku ev malbata bê texmînkirin. Kî tê derxe ku ew balbat kîjan e vê carê ew zûgotinokê dibêje û pirsê dike û yên din texmîn dikin. Piştî zûgotinokê dibêje:

Yek mêt,yek jin,

Du kur û sê keç

Ka bejin ev kê ne?

277. Lîstika Babûta:

Herî kêr bi sê kesan tê lîstin. Bi riya peşkê pîrika lîstikê tê hilbijartin. Pîrik di pozisyona rukuyê de disekine ji yên din yek xwe davêje ser piştê pîrikê û vê zûgotinokê dibêje û yên din jî xwe davêjin ser.

Babûta xweş babûta

Sala duduya çûme çiya

Du pîra dew dikêyand

Pîrê pîrê pîçî rûn bide ser hesanê min

Diçim ser çil rezan

Gayê reşê qîr sere xwe da nav du keviran

Jê derxist da nav du kepiran

Jê derxist du qîzê du vezîran

Yek ji ma û yek ji ta

Bi şîmaqan li pişta pîrikê dixê û van gotinên li jêr dibêje:

Tepana yekane

Tepana duyane

Tepana qedyane

Bi kulman li pişta pîrikê dixê û van gotinên li jêrê dibêje:

Kulmika yekane

Kulmika duyane

Kulmika qedyane

Pişta pîrikê diquncirîne û van gotinên li jêrê dibêje:

Qurmuçka yekane

Qurmuçka duyane

Qurmuçka qedyane

Di vê navberê de bêtî xetaya pîrikê kî xetayekê bike ew dibe pîrik. Heke kes lîstik bê xeta biqede pîrik dîsa bi peşkê tê hilbijartin.

49. Pêncok

Ev lîstik bi pênc kevîrên çapa wan derûdora 1,5-2 cm û ji hê hêla du kesan ve tê lîstin. Kî pêşiyê vê zûgotinoka li jêrê bêje ew ewil dest bi lîstikê dike.

Erê merê e li berê  
Êşê mêşê e li pêşê

Ji be ku lîstik dirêje û mijara me jî zûgotinok e em lîstikê şirove nakin.

50. Kerika Kerhajtî

Ev lîstik di navbera du koma zarokan de tê lîstin. Komek dibe pîrik. Yek ji zarokên pîrikin herdu desten xwe dide ser patika xwe û bêyî ku li pişta xwe binêre disekine û yêkî ji koma din tiliya xwe ya şhadetê dide ser patika wî û wî dajo. Ji koma pîrikan yek dipirse:

Kerika ker hajtî

Ew kî ye kera mala bavê min dajo?

Yê ku tê ajotin texmîn dike ka ji hêla kî ve tê ajotin. Dema ku rast nebêje yê ku wî dajo li pişta wî siwar dibe û heta destpêkê dibe.

51. Birbir Beran

Ev lîstik di navbera du koman de tê lîstin. Herdu alî bi zûgotinokan xîtabî hevdu dikin. Her lîstikvanek navê giyayek, ajalek an jî eşyayekî li xwe dike. Ji koma hember lîstikvanek bang dike (Mînak navê du lîstikvanan Hîv û Tav bin):

Koma yekem: Bir bir beran

Koma duyem: Rabû kelan

Koma yekem: Hîv bê?

Koma duyem: Bira bê.

Koma yekem: Roj bê?

Koma duyem: Bira bê.

Piştî zûgotinokê ji koma yekem kesên navên wan Hîv û Tav diçin aliye koma duyem ji koma duyem du kes yan didin piştî xwe û tînin aliye koma yekem. Piştî re ji bo lîstikvanên din eynî tiştê kirin.

## 52. Sê Mem

Bi sê kapan û du kesan tê lîstin. Lîstikvanek her sê kapan wekî zarên tewleyê bê avêti davêje. Her sê kap eynî pozîsyonê de bisekinin dibe sê mem. Heke sê mem nebe dora avêtina kapan tê lîstikvanê din. Kê sê mem bavêje, dîsa kapan davêje. Heke dîsa sê mem bavêje dibe şeş mem. Kî ewil bigihêje 21 memê bi guhê lîstikvanê din digire û dişidîne û dibêje:

Hilerî milerî

Avê da bin derî

Bavê wî çû bajêr

Jê ra çî werî?

Piştî vê zûgotinokê dîsa kapan davêje û rêzika dawî ya zûgotinokê sê caran dibêje û kapan sê caran davêje. Di destê dawî de kap çawa sekinîbin lîstikvanê din heta ku kap wek destê dawî bisekinin davêje û di wê navberê de guhê wî tê kişandin.

Her wiha zûgotinokên hejmara wan 42, 43, 44, 45, 53, 54, 55, 56, 107 in dikevin bin banê vî cureyî.

### 2.1.2.3. Zûgotinokên Ku Bi Lîstina Peyvan Çêdibin

Ev cure bi lîstina peyvan û denga çêdibe li ser xweşaşkirinê ava dibe, di pêşketina ziman de bandora vê cureyê li ser zarokan zêde ye. Armanç ji hev derxistina deng û peyvan e. Ji ber vê gotina wan ji hêla fonetîkê ve dijwar e. Di navbera peyvan de ji hêla naverok û mijarê ve lihevkirinek nîne. Ev cure carinan jî bi armanca nasandina tiştan tên gotin.

Dema meriv van zûgotinokan ji hêla teşê ve dinirxîne, meriv dibîne ku di navbera ristan an jî di hevokan de bi piranî pîvaneke bi rêk û pêk tune lê di nava



xwe de xwedî aheng in. Aliyê wan î nezmî zeîf e lê ji hêla alîterasyonê ve dewlemend in.

139. Bivrê badayî darê da mayî

Bivrê badayî bayê da mayî.

Di vê zûgotinêkê de tîp û peyvên nêzî hev hatine bikaranîn. Di vir de li ser tîpa ‘b’ û ‘d’ hatiye lîstin 5 cîyan de ‘b’ di 5 cîyan de jî ‘d’ hatiye bîkaranîn, kemîn jî li ser tevlihevkirina b-d yê ava bûye û dîsa kemîn di peyva darê û bayê de heye bipiranî dema xweşaş dikin darê dibe dayê, bayê dibe bavê.

140. Min dît gurek li ser girek,

Gurê ker, ker ker kir

Di vê mînakê de jî hem li ser tîpên nêzî hev listin heye hem jî li ser peyvan lîstin heye. Ker di wateya ajal de ker ker kir jî di wateya kerîkirinê de hatiye bikaranîn û tîpa ‘k’ û ‘g’ jî ji hêla deng ve nêzî hev in li dû hev gotina wan dijwar e. Hin cûre zûgotinok û mamik tevlihev in, vegotin wek zûgotinok e, lê di dawîyê de pirs heye. Ev cure jî bi lîstina peyvan çêdibe:

141. Tişt in mişt in,

Sernivîşt in,

Baran barî xwe guviştin?

Di vê mînakê de hem bi dengê “ş”yê alîterasyon hatiye kirin hem jî “îşt” wek qafiye hatiye bikaranîn. An jî ev mînaka ku zûgotinok-mamik tevlihev in dê vê yekê xurt bike (Subaşı, 2014, s. 26).

Ev cure zûgotinok ji aliyê mezinan ve ji bo zarokan tên çêkerin. Lê bi tenê zarok na, mezin jî van zûgotinokan bi kar tînin û dilîzin, ev cure zûgotinok di nav mezin û zarokan de civateke hevpar çêdike û dibe sedema têkliweke xurt zarok û mezin, zarok û zarok, mezin û mezin di her civatî de cîyê xwe dibîne û bi vî awayî

demeke xweş derbas dikin. Di vir de lîstik li ser vegotinê ye kî rast û zû bibêje ew bi ser dikeve.

137.           Şokî sabûn  
                  Du şo sabûn  
                  Sê şo sabûn  
                  Çar şo sabûn  
                  Pênc şo sabûn  
                  Şeş şo sabûn

138.           Heft heft heft zêwî,  
                  Heft heft heft fêkî  
                  Heft hirç, heşt hirç,  
                  Heft heşt hirçên bipirç

142.           Min pêçiya xwe da quna qijikê,  
                  Qijikê got qijt,  
                  Qijikê qûna xwe da pêçiya min,  
                  Qijikê got qijt

Her wiha zûgotinokên hejmara wan 140, 143, 144, 146, 148, 149, 150, 151, 152, 153, 154, 155, 156, 157, 158, 159, 160, 161, 162, 163, 164, 165, 166 in dikevin bin banê vî cureyî.

Hin cure jî hene ku zûgotinok tevlihev e, di peyvan de ciyê kîteyan diguherin û ji zarokan re dibêjin ka sê caran bêje heke zarok peyvê tê derxe rastiya peyvê dibêje çêr li xwe nake:

167. Lek-im çê

Lek-im çê

Lek-im çê

168. Lik-im go

Lik-im go

Lik im go

169. Le-me tû

Le-me tû

Le-me tû

Di mînakên jorîn de dema sê caran li ser hev du bê got in kesê / a ku dibêje ji xwe re dibêje çêlek, golik û tûle(se) heke zanibe dibêje na ez çêlek / golik / tûle nînim

#### **2.1.2.4. Zûgotinokên Pesin, Bizar, Heqaret û Biçûkxistinê**

Zarokan, ji bo heqaretê li hev bikin, hevdu biçûk bixin an jî kesên ku dilê wan jê re naxwaze biçûk bixin û heqaretê lê bikin zûgotinok afirandine. Ev zûgotinok carinan bi listina nav û paşnavê, navê dê û bavê an jî bikaranîna taybetiyên fîzîkî derketine holê.

172. Hêlkê şimqet

Nav guhê te ket

Tu bi ehmeq

282. Kundir kundirê Eyşanê

Çêtire jê genimê Derûnê

Hemo û Çeto bira ne

Rahêjtin kerk û kalan e

Qetirkê kundir biha ne

Nadime gundî û ciran e

173. Ha rût,

Ma rût

Harûn

Qûnrût (K10).

Her wiha zûgotinokên hejmara wan 171, 174, 175, 176, 177, 178, 179 in dikevin bin banê vî cureyî.

#### **2.1.2.5. Zûgotinokên Ku Ji Bo Şabûnê, Xweş Wext Derbaskirinê Tê Gotin**

Di vî cureyê zûgotinokê de armanc ew e ku hem kesên dibêjin hem jî kesên guhdar dikin bi gotina zûgotinokan kêfê bigirin û wextê xweş derbas bikin.

180. Heblan deblan

Çîlo çeplan

Bisko enber

Xatûn gozel

Perê çukê

Wê li gedukê

Mam Emero

Xwelî sero

Here dero

181. Her hebî her hebî

Ji vî çelebî

Salê hebek hebî

Ew jî li mala me bî

Her wiha zûgotinokên hejmara wan 182, 183, 184, 185, 186 in dikevin bin banê vî cureyî.

#### **2.1.2.6.Zûgotinokên Dua û Daxwazan**

Berê wexta qeza û belayek bihata serê civakê, însan derdiketin cihekî ji bo ku ev bela dehf bibe ji xwedê re dua dikirin.Ev yek zêdetir dema qulixayî hebûya û baran nebariya an jî demeke dirêj baran bibariya û hewayê venekiriba dihat kirin.Ji ber ku zarok jî bê guneh dihatin qebûl kirin,bi armanca dua bèn qebûlkirin zarok jî bi xwe re dibirin duayê.Ev dua piştî demekê di devê zarokan de ketin forma zûgotinokan û zarokan ew merasîm ji xwe re kirin lîstik û ew zûgotinok di nava lîstika xwe de gotin (Duymaz, 2002, s. 160).

187. Zarok dema bûka baranê digerînîn wiha dibêjin:

Bûka me baran dixwaze,

Golikê me giya dixwaze,

Kalikê me dia dixwaze

Heneqneqî walwalî,

Buka me beran divê,

Gulka me giya divê,

Melayi zikat divê,

Me bi xwe genmê sor divê.

Dema ku zarok dixwazin tav derkeve wisa dibêjin:

188. Ewrê here zarokên te birçî ne digrîn

Tavê were zarokên te têr in raza ne

189. Qerqûş merqûş,

Xwedê kurkî bavê dergûş,

Ka dasê bide min, ez herim pûş.

Dema baran nebare, erd û zevî bêav bimîne, zarok Bûka Baranê (ya ku ji dar û potikan çêkirî) kuçe bi kuçe, mal bi mal diğêrinin, li deriyên malan dixin, dûrikan dibêjin û ji her malekê tiştên wek genim, bilxur(savar), rûn, nan berhev dikin.

190. Bûka me baran dixwaze

Golika me gîha dixwaze

Yek Elî, yek Emer

Ser doşeka pêxember.

191. Bûka me baran dixwaze  
Golka me giya dixwaze  
Rebî tu baran bidî  
Milk û mala av bidî.

192. Baranê bibar bibar  
Çûçikan genime te xwar  
Sêwîyan serê hev xwar.  
Baranê bibar bibar  
Sêwîya serê hev û du xwar.  
Şûlikê me şûl avi divê  
Genime me barani divê

193. Golika me destîkî giha divê  
Melayê me jini can divê.

#### **2.1.2.7. Zûgotinokên Bi Bandora Perwerdeyê Çêbûne**

Ev cure bi bandora perwerdeyê çêbûye zarok dema tiştên nû hîn dibin, lîstikên nû ji xwe re diafirînin, herdu mînakên ewil bi bandora dersa îngilîzî derketiya, ya sisiyan bi bandora dersa Quran'ê çêbûye. Zarok di dersê bi gotina van zûgotinokan şa dibin û hînbûnên xwe bi kar tînin.

194. Van tû tirî  
 Şalê.....(Navê Kesê-Berat) dirrî  
 Berat bo girî  
 Babê bo durî
195. Go here  
 Come were  
 Qapî der e  
 Husnî (navê kesê) ... ker e.
196. Ebcêd hewez hutara,  
 Helaw çêke,  
 Ji Baba Seyda ra.

## 2.2. Avaniya Zûgotinokên Lîstikan

Zûgotinokên lîstikên zarokan bi piranî di forma nezmê de ne. Lê di hinek ji yên wek diyalog in de hêmanên nezmê tune ye.

Her çi qas zûgotinok xwedî rîstekî bi rêk û pêk nebin jî dema meriv dêna xwe didê meriv dikare bêje ji hêla teşeyê ve formekî wan heye. Hinek ji wan xwedî serwa ne hinek ji wan serbest in, hinek ji wan li rîsta helbestan tîn, hinek nayên. Ji ber vê em nikarin bêjin teşeyê zûgotinokan ev e, ji ber ku tevlihev e, ji ber vê em ê li gor avaniya wan biseniffînin.

### 2.2.1. Yên Ku Xwedî Serwayekî Bi Rîst Nînin

Zûgotinokên ku bi hejmarên 3,12,7,27,28, 34,,45,50,56,87,58,61,70, 75,80, 87, 89, 99, 92 hatine dayîn xwedî rîstekî nîn in ji bo ku baştir were fêmkirin em ê mînakeke ji wan bidin.



89.

Xalê Bekir	a
Çavê xwu vekir	a
Eynik danî	b
Li xwu mêze kir	a
Serê xwu şuşt	c
Riye xwu şe kir	a
Xurîniya xwu kir	a
Bi şîr û şekir	a
Şal û şapik	d
Li bejna xwu kir	a
Ne go da mi	e
Ne bi peyva te kir	a
Rabû bi rê ket	f
Çû Diyarbekir	a
Ax bê aqil	g
Xalê Bekir.	a

Ev zûgotinok,ji şazdeh risteyan pêk tê û riste girêdayî hevdu ne. Di serwayê de li hev kirinek tune serwaya zûgotinokê di hin risteyan de li hev anîn hebe jî bi rêk û pêk nîn e.

## 2.2.2. Yên Ku Xwedî Serwayekî Ne

Ev cure jî di nav xwe de dibin du beş.

### 2.2.2.1. Yên Ku Serwayên Wan Li Rista Helbestekî Tên

Zûgotinokên hejmarên 2, 11, 13, 14, 15, 16, 39, 40, 41, 44, 52, 57, 64, 65, 66, 74, 76, 95, 42, 107, 119, 126, 127, 128, 120 hatine diyarkirin, bi pîranî çarîk in li teşeyê qewlêrkê tên. Dê bi mînakê baştir zelal bibe:

107.	Pişo virda	a
	Pişo wê da	a
	Mîn şîrqamek li qûnê da	a
	Goşt va ye di qulika darê da	a

### 2.2.2.2. Yên Ku Xwedî Serwayekîne Lê Li Tu Rista Helbestekî Nayên

#### 2.2.2.2.1. Rêzikên Di Nav Xwe De Bi Serwa

Zûgotinokên 5, 6, 17, 18, 19, 22, 23, 24, 25, 26, 35, 43, 47, 48, 51, 53, 81, 82, 83, 86, 88, 90, 93, 96, 97, 98, 101, 104, 105, 106, 112, 110, 133, 122, 116, 113 dikevin nî cureyî. Di vê cureyê de rista serwayan li tu qalibê helbestê nayê lê rêzikê wan di nav xwe de xwedî serwane.

22.

Yekê yekê	a
Dukê dukê	a
Gula çepê	a
Çep li mîzê	a
Tira qûnê	a
Guh perçûnê	a

#### 2.2.2.2.2. Yê Di Serî De Bi Serwa Dawî Serbest

Zûgotinokên 8, 9, 11, 39, 45, 46, 61, 63, 64, 67, 85, 100, 5, 109, 108, 111, 115, 123 ji bo vê cureyê mînak in. Di serî de di ristekî de ne ,di dawî de bi rêzikek an jî du rêzikan rista serwayê xera dibe.

100.

Yek û yek a

Teyrê belek a

Zaza bilbil b

Dermanê dil b

Şekir û şima c

Li ber çema c

Çem çikçikî d

Av tê nema. c

#### 2.2.2.2.3. Yê Di Serî De Serbest Dawî Bi Serwa

Zûgotinokên hejmara wan 10, 35, 36, 59, 72, 77, 84, 91, 39, 94, 103, 130, 131, zûgotinokên ku bi van hejmaran dest pê dike di serî de hevokek an jî du hevok serbest dest pê dike rezikên din di nav xwe de xwedî serwayekî ne. Em li Zûgotinoka bi hejmara 84'an binêrin.

84.

Silêmane dunikul a

Çû ser darê tirek kir b

Hat bin darê fisek kir b

Çû mahkemê deng nekir      b

Hat malê fedî kir.              b

#### 2.2.2.2.4. Yên Serî Û Dawî Serbest Nav Bi Serwa

Ev cure zêde nebe jî, zûgotinokên 21, 102, 94 ji vî cureyê ne. Em li zûgotinoka 21'an binêrin. Ristek an jî du rist di serî û dawî de serbest in, ristên navîn di nav xwe de xwedî serwayekî ne.

21.

Yek dudu      a

Mawer sisê      b

Çiqla fisê      b

Simbil baqo      c

Çav şîlaqo      c

Qirç....!      d

#### 2.2.2.2.5. Yên Serî Û Dawî Bi Serwa Nav Serbest

Zûgotinokên 58, 34, 16, 53, 70 bi vî hawî ne. Di vî cureyê de serî û dawî bi serwa ne lê di nav de bi çend hevokan xera dibe, di dawî de dîsa bi serwa diqede.

16.    Yek û yek              a

Teyrê belek              a

Zaza bilbil              b

Dermanê dil              b

Şerq û şema              c

Li ber çema              c

Çem miçiqî d

Av tê nema e

Ez kuncî f

Tu kuncî f

Li ser textikê firincî f

Ez firiyam g

Tu ma li cî f

#### **2.2.2.2.6. Yên Pirs Û Bersiv**

Ev Zûgotînok bî pirs û bersivan ava bûne hinek ji wan di nav xwe de xwedî serwayekî ne. Zûgotinokên 33, 51, 54, 60, 68, 73 bi vî awayî ne.

17.

Bir bir beran a

Rabû kelan a

Hîv bê? b

Bira bê. b

Roj bê? b

Bira bê. b

#### **2.2.2.2.7. Zûgotinokên Wek Dîalog**

Zûgotinoka hejmar 46 di vê teşeyê de û bi tenê em rastî mînakekî hatin

46.

Mamê Mus!

Lebbê Hus!

Bê te derbika bênamûs?

Bira bê.

### 2.3. Di Zûgotinokan de Meseleya Varyantê

Di tirkî de cara yekem Petev Naili Boratav li ser vê meselê sekiniye. Di xebata xwe ya bi navê Tekerleme de zûgotinokên çîrokan wek “tip” dinirxîne. Boratav, diyar dike ku di meseleya tîpê de gotinên qalibî bi tena serê xwe meselaya tîpê zelal nakin; wate, çîrok û fonksîyon jî di diyarkirina tîpê de girîng in. Di hinek cureyan de zûgotinok bi heman gotinên qalibî dest pê dikin û di navê yan jî dawî de mijar diguherin (Boratav, 2000, s. 10).

Nerin Yayın jî li ser vê meselê disekin e. Yayın dibêje ku wê mesleya tîp û varyantê bi alikariya gotinên qalibî zelal bike (Yayın, 2009, s. 59).Lê her çiqas behsa zelalkirina meselê bike jî, vê meselê zêde şîrove nake û zêdetîr ji Boratav mînanan dide. Bi tenê diyar dike ku varyant di bin banê tîpê de ye.

Divê em diyar bikin ku mesleya varyantê meseleyeke zelal nîn e. Öcal Oğuz dibêje ku heta niha peyva varyant û versiyonê di şûna hev de hatiye bikaranîn ji ber ku peyva varyant û versiyonê ne bi tirkî ne, dema derbasî tirkî bûne şaş derbas bûne û diyar dike ku ev mesele divê ji nû ve werin şîrove kirin (Oğuz, 2000).Ev mesel meseleyeke zanistî ye pisporî dixwaze ji ber vê jî em ê tenê behsa vê meselê bikin û zêde şîrove nekin. Em têdigihîjin ku peyva varyantê çarçoveyê berfirehtir di hundirîne ji ber vê jî me peyva varyantê tercîh kir.

Dema me zûgotinokên lîstikan dan hev, em rastî gelek zûgotinokên nêzî hev hatin. Dema me dêna xwe dayê her çiqas nêzî hev bin jî cudahî di navbera wan de gelek e. Di hinekan de cudahî bi tenê di vegotinê de heye; di hinekan de hevok û

mijar jî dugeherin, hinek ji wan dirêj hinek ji wan kin in. Di hinekan de hevokên ewil û hin gotinên qalîbî dubare dikin, di hinekan de jî fonksîyon diguherin.

Me di çarçoveya vê xebatê de 17 heb zûgotinokên lîstikan ku varyantên wan hene tespît kirin. Me zûgotinokên lîstikan ên nêzî hev dan hev û cudahî û nêzîkatiya wan muqayese kir. Ji hêla fonksîyon, wate, û gotinên qalîbî ve muqayese kirin.

### 2.3.1. Rêvî Rêvî Rindik

Zûgotinokên 23, 27, 82, 124 varyantên hev in.

124.

Ha rovî rovî rindiko

Ha rovî rovî mamê min

Dev kutaye paqa min

Rovî hate nav mala

Bigirin bidin ber dara

Roviyo dev şûjino

Dev kutaye lingê mino

82.

Rêvî rêvî rindik

Serê dûva rêvî bi kincik

Rêvî çû mala axa

Anî heft bar ardê dara

Lê xistin bi nişk û qutik û dara

Bijmêr bijmêr hek ne bîst û çara

27.

Rêvî rêvî

Rêviyê rindik

Serê teriya rêvî

Pir bi pirçik

Rêvî çûye

Mala xalan

Bar kiriye hişk daran

De bijmêrin

Bîst û çaran

Heger bîst û çar derneket

Min têxin binê çalan

23.

Rêvî rêvî rindik

Serê duva rêvî bi kincik

Rovî çûye mala xala

Anî heft bar ardê dara

Lê xistin bi hişk û qutik û dara

Bijmêr bijmêr hek ne bîst û çara

Zûgotinikên bi hejmara 23 û 82an gelek nêzî hev in. Di rêza sêyan de rêvî bûye rovî di rêza pêncan de di navbera peyvên “nişk-hişk” de guherîn heye wekî din



rêz birêz mîna hev in. Zûgotinoka 27'an cureya herî dirêj e. Zûgotinokan bi hejmra 124'an de di şuna rêvî de rovî hatiye bi karanîn wekî din guherîn zêde ne. Di her çaran de jî hevokê ewîl pir nêzî hev in anjî mîna hevîn ber bi dawî yê ve guherîn çiqas diçe zêde dibe. Lê dema em dêna xwe didin mijaran di her çaran de jî mijar yekin Roviye rindik diçe malekî û di dawîyê de kutanê dixwe di her çaran de jî tê derxistina hejmara 24'an heye. Zûgotinika 27'an de mijar zelatir dibe rovî daran bar dike û dibeje heke nebû 24 li min xin. Jixwe ev hevok armanca lîstikê dide ji ber ku lîstik lîstika tizbîyê ye, bi hejmarê 24 derxin.

### 2.3.2.Hêklo mêklo

133.

Hêklo mêklo

Çar im çéklo

Biska Xemé

Ara fingé

Pé qulingé

Hate vî ya

Dani vîî ya

110.

Hêklo mêklo

Çarim çeklo

Hestiyê kewê wê

Li ber cewê

Kewika firî

Mamkê gurî

Heban dirî

Pirrrr li serserê

Avzemê de birrî

72.

Hêkil mêkil

Çalim çêkir

Hestîyê kewê

Li binê mêtewê

Mêtew ketya

Kew firya

30.

Hêklo mêklo

çalim çêklo,

Hestiyê kewê

Li ber kewê

Kewê firî mamo gurî,

Hat ser vir da rî/danî...

Me çar cureyên zûgotinoka Hêklo Mêklo tespît kir. Di her çaran de jî herdu rêzikên destpêkê mîna hev in û bi tenê guherînine biçûk hene. Di zugotinokên 110 û 133 de destpêk:

Hêklo mêklo

Çarim çêklo

.....

Di zûgotinoka 30'î de :

Hêklo mêklo

Çalim çêklo

Di zûgotinoka 72 'an de:

Hêkil mêkil

Çalim çêkil

Zûgotinokê bi hejmarên 110, 72 û 30'î de “hestiyê kewê” mîna hev hatiye bikaranîn di 133'ê de hestiyê kewê tune û varyanta herî cuda jî ev e. Di her çaran de jî dawî ji hev cu da ne. Zûgotinokên bi hejmara 110, 72 û 30'î de di dawî de hevoka “kewê dê firî” 110 û 30'î de piştî hevoka “kewê firî” hevok lê zede dibin. Di 72'an de bi hevoka kewî firî bi dawî dibe.

### 2.3.3. Kerikê Kerajo

37.

Kesê Yekem:Kerikê kerajo,kê te dajo?

Kesê Duyem:(Navê yê dajo texmîn dike) min dajo.

50.

Kerika Kerejo

Kerika ker hajotî

Ew kî ye kera mala bavê min dajo?

Kesê Duyem: (Navê yê dajo texmîn dike) min dajo.

Di navbera du varyantan de guherîn di dibebi vî hawî ye 37'an de "kerajo" di 50'yî de dibe "kerhajotî" 37'an de "kê te dajo" di 50'yî de dibe "Ew kî ye kera mala bavê min dajo?" Her çiqas zûgotinok kin be jî disa jî guherîn çêbûye û dîsa di hevokên dawî de lêzêdebûn peyda bûye. Lê ji hêla mijar û fonksiyonê ve di navbera du varyantan de guherîn tune.

#### **2.3.4. Pişo Vir da**

40.

Pişo vir da

Pişo wê da

Min şîrgamek li qûnê da

Pişo vay paşla (navê zarok).... de

107.

Pişo virda pişo wê da

Min şîrgamek li qûnê da

Goşt va ye di qulika darê da

Di vê zûgotinokê de jî her du rêzên ewil peyv bi peyv eynî ne hevoka sêyem bi temamî guherî ye. Ji hêla wate û fonksiyonê ve tu guherîn tune.

### 2.3.5. Mişko Mişko

41.

Mişko mişko

Neyarê nanê hişko

Nanê hişk di kur de ye

Mişko bixwo (Herêm: Karaz/Amed)

67.

Ha gidî mişko

De gidî mişko

Tu dijminê nanê hişko

Ha gidî mişkê wisa kovi

Tûr û barê me kir nêvi

Ax, ax, ax!

74.

Mişko!

Mişko apê mişk

Dûv rûtikê serbirişk

Kînga pisik nayê mal

Ew tê diziya nane hişk.

Di zûgotinoka Mişko de sê varyant hatin tespîtîkirin. Di hevokên ewil de wekî ku tê dîtîn guherîn heye lê di hersêyan de jî armanc bangkirina mişko ye. Di nav

hevokan de guherîn zêde ye. Lê dema em bala xwe didinê, dibînin ku tiştên hevpar jî zêde ne. Di hersêyan de jî mişko ji nanê hişk hez dike û tê diziya nanê hişk ango ji hêla mijarê ve eynî ne. Dîsa ji hêla wateyê ve guherîn hindike û fonksiyona hersêyan jî eynî ye.

### 2.3.6. Silêmanê Du Nukil:

84.

Silêmane dunikul

Çû ser darê tirek kir

Hat bin darê fisek kir

Çû mahkemê deng nekir

Hat malê fedî kir.

86.

Silo Silo

Dunikulo!

Dasê bigire

Here çilo

Holikê çêke

Zilfikê tê xe

Holik hilkişya

135.

Silêmanê du nukil

Çû Îranê şixul kir

Hetanî hat jinik mir

Kumik danî bavo kir

Di zûgotinoka Silêmanê Dunikul de guherîneke diyar heye. Di hersê varyantan de jî di hevoka yekem de bang li Silêmanê dunikul tê kirin. Di zûgotika 86'an de teşeyê vegotinê diguhere lê di hevokên li dû de guherîn zêde ne. Zûgotinoka 86'an ya herî dirêj e. Tê de ji hêla wateyê ve guherîn zêdeye di fonksiyonê de guherîn tune.

### 2.3.7. Dûvmeqes

19.

Hesê hesê

Dûv meqesê

Kevira hilkê

Gazî Mîrke

Mîr hecî ye

Tivingçî ye

Kew kuştiye

Xwîn xwariye

Pê miriye (Çınar, 2005, s. 14).

65.

Hesê Hesê

Dûvmeqesê

Kevira hilke

Gazî mîr ke

Mîr hecî ye

Tivingçî ye

Kew kuştiye

Xwîn xwariye

Pê miriye

106.

Besê

Besê

Dûvmeqesê

Kevir rakin

Ba mêra kin

Mêr hecî ne

Tifekçî ne

Xwin xwarine

Pê mirine.

Di navbera varyantên zûgotinoka Dûv Meqes de ji hêla peyvan ve cudahiyên biçûk hene û ev guherîn, guherînên peyvên hemwate ne û îxtîmalek mezin bi bandora herêman ev guherîn çêbûne. Wekî din ji alyê fonksiyon û wateyê ve guherîn tune ye.



### 2.3.8.Yekê Yekê

18.

Ooooo yekê yekê

Dabistanê

Ezîzanê

Xana gijê

Dotra îne

Ser keskîne

Heba tirî

Digindirî

Şam û şe ye

Gul hine ye

Bîst li te ye.

24.

Yekê Yekê

Dabistanê

Ezîzanê

Xana gijê

Dotra îne

Serkesîne.

Zûgotinoka Yekê Yekê de ya hejmara 18an di destpêkê de Ooooo lê zêde bûye, heya gotina “dotira îne” guherîn tune ye. Piştî vê gotinê, “disa” li 18an zêdebûye ango ji 18an kêmbûye. Ji hêla fonksiyonê ve diyar e ku zûgotinoka 18. ji bo pîrik hilibijartinê tê gotin lê zûgotinoka 24an ne zelal e ku ji bo çi hatiye gotin.

### 2.3.9. Sat Axa Satil Axa

17.

Sat axa

Satil axa

Qûn axa

Hilifî milifî

Çak çulifî

Ar tûtik

Şêx Geylanî

Dev rûtik.

83.

Sat axa satil axa

qûn axa qantir axa

hulipî mulipî çarçilupî

ar tûtik berwar tûtik

Evdilqadir gi rûtik

Di varyantên zûgotinoka Sat Axa Satil Axa de dema em bala xwe didinê heta gotina “qûn axa” guherîn tune ye, guherîn li dû wê destpê dike. Lê tiştê ku balê

dikşîne ser xwe, her çiqas peyv biguherin jî, ji hêla alîterasyonê ve nêzîkatiya di navbera wan de ye. Ji hêla wate ve guherîn hindik e û ji hêla fonksîyonê ve guherîn tune.

### 2.3.10. Yek û Yek Teyrê Belek

16.

Yek û yek

Teyrê belek

Zaza bilbil

Dermanê dil

Şerq û şema

Li ber çema

Çem miçiqê

Av tê nema

Ez kuncî

Tu kuncî

Li ser textikê firincî

Ez firiyam

Tu ma li cî.

100.

Yek û yek

Teyrê belek

Zaza bilbil

Dermanê dil

Şekir û şima

Li ber çema

Çem çikçiki

Av tê nema.

Zûgotinka Teyrê Belek du cureyên wê hat bi destxistin. Dema em bala xwe didinê dibînin ku heta “dermanê dil” di navbera wan de tu guherîm tune. “Şerqû şema” dibe “şekir û şima” “çem miçiqî” dibe “çem çikçiki” piştî hevoka “av tê nema” zûgotinoka bi hejmara 16an didome.

### **2.3.11. Yekê Yekaneke**

10.

Ooooooooo

Yekê yekê yekaneke

Sê hacekî

Bîst qulingan

Hêkê kewê

Li bin kewê

Kew firiya

Çav rijiya

Bîst li vîya.

15.

Oooooo yekê yekaneke

Dilo çepo

Çepîl mijo

Xana gijo

Dotra îne

Li ser mizgîne

Golika xalan

Çû pişt malan

Ne guran xwar

Ne dizan bir.

35.

Êkan e

Dabiskan e

Xana çepê

Çepil mizê

Ara gîzê

Tote hîne

Serkêşîne

Hilkêşîne

101.

Oooooo yekê yekê yekaneke

Se hacekê

Bîst qulingan

Hêkê kewê

Li bin kewê

Kew firiya

Çav rijiya

Bîst li viya

103.

Yeka nekê

Gula çapê

Çepla mijo

Xana gijo

Gul tirhîno

Ser birçîno

Du maren reş

Du gulên geş

Mîr xatûn

Ez û tu

Pev ra xweş

102.

Ooooooo yekê yekaneke

Dilo çepo

Çepil mijo

Xana gijo

Dotra îne

Li ser mizgînê

Golika xalan

Çû pişt malan

Ne gur xwar

Ne dizan bir.

Ji zûgotinoka “yekê yekaneke” şeş varyant hatin tespît kirin, zûgotinokên bi hejmarên 10, 15, 101 û 102 dest pêka wan peyv bi peyv mîna hev in. Varyanta bi hejmara 35an diguhere bi “Ekane dabiskane” dest pê dike. Zûgotinoka 103an kin dibe bi tenê “Yekaneke” dest pê dike. Zûgotinokên 101 û 10an mîna hev bi dawî dibin, zûgotinokên bi hejmara 15 û 102an dawîbûna wan mîna hev in, ji zûgotinokên bi hejmara 35 û 103an, her yek bi awayekî cuda bi dawî dibe û di rêzikên navîn de peyvên hevpar jî hene. Dema em li fonksiyona wan dinêrin hinek ji wan ji bo neqandinê hinek ji wan ji bo hilibijartinê hatine gotin. Zûgotinoka 35an diyar e ku ji bo lîstika nig kişandinê hatiye gotin.

### **2.3.12.Şemso Quto**

2.

Yek didoke du masî

Şemso Qûto rûbasî

Hinno dîno faris

Doraya te ye tu kus.

14.

Yeylo diklo dinoze

Şemso kito repoze

Keçê miçê yarek çê

Qare qotik fispirçe!

97.

Yeklo

Duklo

Dimpaze

Qereqotik

Pismircik

Keçê

Meçê

Şemso

Quto

Repazê

95.

Yeklo diklo temazê

Şemsê, qutê repazê



Geçê meçê eraqçê,

Xirnaqotik fis bircik

96.

Yeko duko

Du naziko

Rep e ziko

Şama quto

Êl qotikê

Serpirçikê

Zûgotinoka şemso quto de pênc hatin tespît kirin. Di her pêncan de jî peyva “şemso quto hevpar e”. Dema em bala xwe didinê dibînin ku zûgotinokên bi hejmara 95 û 97 bi “yeklo diklo” destpê dikin 14 “yeylo diklo” destpê dike îxtîmalek mezin deformasyona “yeklo diklo” ye “ keçê meçê”, “geçê meçê”, “ keçê miçê” 14, 97 û 95an de guherîn bi awa yî çêbûye. Dawîbûna 95, 96 û 14 dişibin hev. Xeynî zûgotinoka duduyan her çar zûgotinokên din em dikarin bêjin ku varayantên hev in. Lê zûgotinoka duduyan dema dinêrin wate zêdetir guhriye û peyvên hevpar kêr in. Ji hêla fonksiyonê ve em jê fêm dikin ji bo pîrik hilbijartinê tê bikaranîn di yên din de zêdetir bi lîstina peyva çêbûne. Armanç hemû hevokan bi rêzê rast goti ne. Zûgotika hejmara duduyan fonksiyona wê jî guherî ye. Ji hêla varyantê ve pirs nîşe çê dike gelo varyant e an na.

### **2.3.13. Yek Dido Sisê**

3.

Yek dido sisê

Çar apê naçar

Çû serê darê

Hata xwar

Di çarde û heftê siwar

Hatin çûn çîya

Lefandin rêsiyê giya

Pez hatin avîya

Berx çûn dangîya

Keça xweşik para min

Ya pintî dûrî min here

Were bibêjim ji te re

Şewlo hate

Eva dora te.

11.

Yek dudo

Bawer sisê

Çeqla fisê

Mamo dîno

Kevirê şîno

Qesra Elî

Çardeh derî

Yek jê teter

Yek jê meter

Navê Xwudê

Elahu ekber.

88.

Yek, dudu, sisê

Çeqla fisê

Memo Zînê

Çavhişînê

Gindir mindir

Xwu li tahtê da

Di cî da mir.

90.

Yek, dudu, sisê

Çeqla fisê

Memê dîno

Kevrê şîno

Çavbeloqo

Simbêltoqo

91.

Yek

Dudu

Bawer sisê

Çeqla fisê

Mamo dîno

Kevrê sîno

Simbêl boqo

Serî doqo.

92.

Yek dudu

Mawer sisê

Simbêl baqo

Çav zilaqo

Qirç

93.

Yek, dudu

Bawer sisê

Çeqla fisê

Mamo dîno

Kevrê şîno

Simbêl boqo

Çavzer doqo

Ar tûtik

Berwar tûtik

Evdilqadir

Devrûtik

94.

Yek dudo

Bawer sisê

Çeqla fisê

Mamo dîno

Kevirê şîno

Qesra Elî

Çarde deri

Yek jê teter

Navê Xwude

Elahû ekber

21.

Yek dudu

Mawer sisê

Çiqla fisê

Simbil baqo

Çav şîlaqo

Qirç....!

136.

Yek du Sê

Çeqla fisê

Emo Dîno

Kevrê şîno

Qesra elî

Çarde derî

Yek lê peder

Yek lê meder

Ellahû Ekber

Ji zûgotinoka “Yek dido sisê” 9 varyant hatin tespîkirin, varyanta herî zêde me di vê cureyê de tespît kir. Her 9 varyant jî bi “yek dudo “ dest pê dike di berdewamê de hinek “yek dido sisê” hinek “yek dido bawer sisê” an jî “mawer sisê” dewam dike. Xeynî zûgotinoka bi hejmarê 3an “Çeqla fisê” hevpar hatiye bikaranîn, “mamê dîno, kevirê şîno” di zûgotinokên bi hejmarên 11, 88, 90, 91, 93, 94, 136 de her çiqas vegotin guherî be hevpar hatiye bikaranîn. “Qesra Elî, Çarde derî” di zûgotinokên bi hejmarên 136, 94 û 11an de hevpar hatiye bikaranîn. Dawîbûna zûgotinokên bi hejmarên 11, 94, 136 mîna hevin, 91, 21 dawîbûna wan mîna hevin yê mayî her yek bi awayekîne. Ji hêla fonksîyone ve hinek ji wan ji bo neqandinê hinek ji wan ji bo hilnijartinê hatiye bikaranîn.

### 2.3.14. Pişê Pişê

114.

Pişê pişê menteşê

Nan û penêr çi xweşê

Bûka malê çaw reşê

Zarok çûne camiyê de

Sa girte pehniyê de

117.

Pişê pişê nêrgizê

Xwe da ser dîwarê Êngizê

Ne gura xwar ne dizê

Zûgotinika di 114 û 117 de destpêka herduyan jî bi “pişê pişê” ye lê xeynî destpêk û tiştek hevpar di navbera wan de nîne

Wek encam meriv dikare bêje ku ji hêla pêkhatina varyantê ve di zûgotinokên nav listikan de, di rezikên serî de zêde guherîn tune, guherîn ber bi dawî ve zêdetir çêdibe, an kintir dibe an dirêjtir dibe. Tê fêmkirin ku zûgotinok li gor bîranîna zarokan teşe digire, di hevokên ewil de zêde deformasyon çênabe, di dawiyê guherîn çi qas diçe zêde dibe. Em ji hevokê ewil têderdixin ku kîjan zûgotinokan varyanta kîjan zûgotinokê ye. Bi piranî di hevokên navîn de guherînen piçûk hat dîtîn, guherîn bi piranî ji ber devokê ye an jî je ber deformasyonê ye, di hinek zûgotinokan peyvên ku bê wate dixuyê di varyanta heman zûgotinokê de de peyva ku bê wate dixuyê em digîjin wateya wê. Zûgotinokên listikan ji serî ber bi dawiyê ve guherîn zêde dibin, dawî yan bi temamî diguhere yan jî lê zêde dibe, yan jî bi tenê çend hevokên serî bi tenê dimînin û kurt dibin. Lê di hin zûgotinokan de jî serî û dawî bi heman awayî destpê dikin û diqedin guherin di rêzikên navîn de çêdibin. Em nizanin ku kîjan cure

berê derketiye kîjan deforme bûye û kîjan lê zedê bûye yan kin bûye. Lê diyar e ku zarok di rêzikên serî de ji eslê metnê re sadiq in. Ber bi dawî ve ji ber ku ji bîr dikin bi şiklekî din didomînin an jî li gor afirîneri ya xwe diguherînin. Tê fêmkirin ku zûgotinokên nav listikan bi afirîneriya zarokan çêdibin diguherin û di û di teşeyekî de ciyê xwe dibînin.

#### **2.4.Têkiliya Lîstik û Zûgotinokan**

Lîstikên zarokan û zûgotinok di nav hev de ne û hev du tamam dikin. Zûgotinok di nav lîstikê de ciyekî girîng digirin. Zarok her çiqas bi armanca şabûn û xweşwextderbaskirinê zûgotinokan bêjin jî, ev çalakî di her qadê de li ser zarokan bandoreke erênî çêdike. Amadehiya jiyanê pêdiviya agahî û jiyanê di nav lîstikê de bi awayekî xwezayî hîn dibe. Zarok bi zûgotinokan di lîstikê de hînî dîtî, baldarbûn, hîskirin lezgînbûn, bîyardayîn, biserketin, têkçûnê û bikaranîna jest û mîmîkan dibe. Ji aliyekî ve zarok di lîstikê de şa dibe jî aliyekî ve jî hînî tiştan dibe û ji bo jiyanê amadehî dibe (Esen, 2008, s. 359).

Di lîstikê de ji bo ku zarok xwe nasbike û xwe îfade bike fîrsetekê bi dest dixe. Lîstik û zûgotinok li ser sosyalbûna zarokê bandoreke baş dibe. Ji aliyekî ve jî zarok hînî etîk û qûralan dibe. Mesela zarok hînî dorê dibe, hînî hurmetnîşandayîne dibe, feraseta heq û hiqûqê pê re çê dibe, hînî şaşitî û rastiyan dibe. Zarok di lîstikê de ji gelek aliyan ve pêş dixe. Dema zûgotinokan jî tevî lîstikê dibe, ji her aliyê ve li ser pêşketinê bandor dibe. Ji ber ku zûgotinok ji aliyê rîtmê ve dewlemend e, li ser zarokan bandoreke erênî çêdike. Zarok kêfxweş dibin û hînî ezgiyê dibin û bi xêra zûgotinokan ziman, pêşktina zimên, hejmar, ajal, navê bajaran û navê xwarinan zûtir hîn dibin. Piştî lorîkan zûgotinok di hişê zarokan de tovê nirxên estetîk direşîne. Ji ber vê yekê, di perwerdeyê de jî ji zûgotinokan gelek sûd tê wergirtin (Kaya, 2013, s. 9).

Zarok bi zûgotinokan hînî kîtekirinê dibin. Di lîstikê de kîtekirin pir girîng e. Heke di kîtekirinê de şaşitî derkeve dor xera dibe û ji bo lîstikê dor pir girîng e ji ber vê yekê hemû zarok bi baldarî kîtekirinê dişopînin ku heqê kesî wenda nebe. Zûgotinok ji hêla avanî û naverokê ve li gor dilê zarokan hatiye xemilandin. Zûgotinok wek zarokan xwezayî û bi coş in. Zûgotinok di nav lîstikê de bandorên lîstikê yên wek hînbûna yekbûnê, şîrîkbûnê, cudabûn û bihevrebûnê, parvekirinê zêde dibe (ÖNAL, 2002, s. 16).



## ENCAM

Di vê xebatê me xwest em nîşan bidin ka zûgotinok çi ne, bi çi awayî derketine holê; zûgotinokên kurmancî bi çi şiklî ne û di nava lîstikên zarokan de bi çi awayî cî girtine. Di vê çarçoveyê de me xebata xwe li ser du beşan ava kir. Di beşa yekem de bi awayê giştî me zûgotinok nirxandin û di beşa duyem de me zûgotinokên lîstikên zarokan nirxandin ka bi çi awayî di nava lîstikê de cî digirin û xwedan taybetmendiyê çawa ne. Di çarçoveya vê xebatê de me dît ku di nav kurdan de ji vî cureyê edebiyata zarokan tenê navê zûgotinok nayê bikaranîn. Ji bilî zûgotinokê, navên wek çîvanok, lihevanînok, qinik, bizelêv, yaxxane, zûbêjok, zorbêjok, zorgotinok, tiştanok, qinik, nezanok, bizelêvan, çistan, zanîşk, tiştik, şaşmîtik jî tên bikaranîn.

Di beşa yekem a xebatê de, me zûgotinok li gor fonksiyonên wan senifandin û bi gelemperî çar cureyên zûgotinokên kurdî derketin holê:

1. Zûgotinokên Girêdayî Cureyên Edebiyata Gelêrî
2. Zûgotinokên Li Ser Meh û Demsal û Gerestêrkan
3. Zûgotinokên Rojên Taybet
4. Zûgotinokên Lîstikan

Qismek zûgotinokên kurmancî bi cureyên edebiyata gelêrî re têkildar in. Mesela hinek di heman demê de di forma mamikan de, hinek di forma çîrokê de, hinek di forma fablan de, hinek di forma çîrvanokan de ne û hinek jê jî di serî, nîvek û dawiya van cureyan de cî digirin. Qismek zûgotinok, li ser meh, demsal û gerestêrkan hinek li ser rojên girîng yên kurdan hatine gotin. Hinek zûgotinok jî girêdayî lîstikan derketine holê. Ev zûgotinok bi piranî yên lîstikên zarokan in.

Zûgotinokên lîstikên zarokan hinek beriya lîstik dest pê bike, tên gotin ku bi armanca neqandina pîrik, kesên nav lîstikê an jî avakirina tîmên lîstikê hatine çêkirin. Hinek jê jî, di nava lîstikê de tên gotin ku ew jî, ji ber çend sedeman tên gotin. Carinan ji bo balkişandina lîstikvanan ya li ser lîstikê, carinan ji bo zindîgirtina coş û kelecana lîstikê, carinan ji bo bilindkirina asta kêfa lîstikê tên bikaranîn. Hin cureyê zûgotinokên lîstikên zarokan hene ku ew li ser lîstina peyvan ava dibin. Ango

zûgotinok bi guherîna û nêzîkatiya fonetîka dengan ava dibin. Ev zûgotinok tenê ji hêla zarokan ve nayên gotin, ji hêla mezinan ve jî bi aramca lîstikê tên gotin. Hinek zûgotinok jî hene ku di nav zarokan de, ji bo ku hev du biçûk bixin an jî heqaretê li hev bikin tên gotin. Zarok van zûgotinokan bi aramca lîstikê ji hev re dibêjin. Bi gotina van zûgotinokan herdu alî jî dixwazin hevdu hêrs bikin û hevdu têk bibin. Hinek zûgotinok jî hene zarok wan bi tenê ji bo xweş wext derbas bikin, dibêjin. Aramca ew e ku hem kesên dibêjin hem jî kesên guhdar dikin bi gotina zûgotinokan kêfê bigirin û wextê, xweş derbas bikin.

Hinek zûgotinok jî di forma dua û daxwazê de ne û di nava lîstikên zarokan de cî girtine. Ev zûgotinok bi piranî dema demeke dirêj ji ber rewşa hewayê tav dernekeve an jî demeke dirêj baran nebare tên gotin. Zarok ji xwe re lîstik li dar dixin û wan zûgotinokan dibêjin. Zarok, her qada jiyanê li gor dinyaya xwe, dikin nav form û teşeyekê. Piştî ku zarok dikevin nav perwerdeyê zarok tiştên ku ji vê qadê digire ji xwe re dike nav formeke lîstikê. Bêguman ev lîstik jî, bi pêlîstina peyvên ji qada perwerdeyê girtiye çê dibin. Ango em dikarin bêjin zarok bi daneyên xwe yê qada perwerdê ji xwe re zûgotinokên nû ava dikin.

Wekî din, zûgotinok ji hêla teşe ve jî hatin nirxandin û hat dîtin ku hinek jê menzûm hinek jî pexşankî ne. Ji ber ku mijara me ya sereke zûgotinokên lîstikên zarokan e, me tenê zûgotinokên lîstikên zarokan ji hêla avaniya wan ve nirxandin. Bi vê nirxandinê, hat dîtin ku hin zûgotinok xwedî serwayeke bi rêk û pêk in hinek jî jê, ji hêla serwayê ve bê rist in. Hinek di destpêkê de xwedî serwayekî ne lê di dawiyê de rista serwayê xera dibe, hinek di serî de ne xwedî serwa ne di dawiyê de xwedî serwayeke bi rist in û di hinekan de jî di serî û dawiyê de serbest in di navê de xwedî serwa ne. Qismekî zûgotinokên lîstikên zarokan heye di forma diyalogan de û di forma pirs û bersivê de ne. Ev cure bi piranî ji bo birêvebirina lîstikan tê bikaranîn.

Zûgotinokên lîstikên zarokan ji aliyê varyantê ve jî hatin nirxandin. Bi tevahî 18 heb zûgotinokên ku varyantên wan hene hatin tesbîtkirin. Di navbera varyantan de cudahî bi çend awayan derdikeve holê. Di hinekan de cudahî bi tenê di vegotinê de heye; di hinekan de hevok û mijar jî dugeherin, hinek ji wan dirêj bûne ango hevok lê zêde bûne, hinek jî kurt bûne. Di hinekan de hevokên ewil û hin gotinên qalibî dubare dikin, di hinekan de jî fonksîyon diguherin.

## ÇAVKANÎ

Daweta Kêzê. (1942). *Kovara Ronahiyê(7)*, 2.

Akdağ, Z. (2016). *Çîrokên Gelêrî Yên Kurdan*. İstanbul: Enstîtuya Kurdî Ya Stenbolê.

Akdemir, N. (2008). *Kocaköy (Karaz)*. Diyarbakır: Kocaköy Kaymakamlığı Yayınları.

Boratav, P. N. (2000). *Tekerlemeler*. İstanbul: Tarih Vakfı Yayınları.

Boratav, P. N. (2009). *Zaman Zaman İçinde*. Ankara: İmge Kitapevi Yayınları.

Boratav, P. N. (2015). *100 Soruda Türk Halk Edebiyatı*. Ankara: Bilgesu.

Bozarslan, M. (2007). *Masîyên Bejî*. Amed: Weşanên Deng.

Celîl, O., & Celîlê , C. (2012). *Zargotina Kurda II*. Wîyana.

Cindî, H. (2009). *Folkilora Kurda*. Yêrêvan: Weşanxana Lîmûş.

Çınar, H. (2005). *Lîstikên Zarokan Yên Kurd;Lîstikên Heş û Werzîşê*. İstanbul: Gün Yayıncılık.

Duymaz, A. (2002). *İrfanı Arzulayan Sözler Tekerlemeler*. Ankara: Akçağ Yayınları.

Elçin, Ş. (2000). *Halk Edebiyatına Giriş*. Ankara: Akçağ Basım Yayım Pazarlama .

Esen, M. A. (2008). Geleneksel Çocuk Oyunlarının Eğitimsel Değeri ve Unutulmaya Yüz Tutmuş Ahıska Oyunları. *Uludağ Üniversitesi Eğitim Fakültesi Dergisi* , 357-367.

Farqînî, Î. (2011). *Bi Zarê Êzidiyan Çîrokên Gelerî*. Stenbol: J&J.

Farqînî, Z. (2011). *Ferheng*. İstanbul: Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê.

Fîdan, M. (2014). *Çîrokên Gelêrî Ji Herêma Botan*. İstanbul: Weşanên Berbang.

- Gazi, M. (2006). *Gurzek Ji Zargotina Zarokan*. Hewlêr: Weşanxaneyê Aras.
- Güneş, K. (2013). *Mamikên Me, Evrensel Basım Yayın, Stembol, 2013, 37*. İstanbul: Evrensel Basım Yayın.
- Kaya, D. (2013, 12 11-12). *Sivas'ta Çocuk Oyunları*. Web: Di 01 Rêbendan 2019'an de ji malpera dogankaya.com. hatiye girtin.
- Kurdo. (2015). *Zûgotinok. Folklorê Kurdan(2)*.
- Kurdo, M. (2017). *Zûgotinok*. Diyarbakır: Wardoz Yayınevi.
- Oğuz, M. (2000). *Türk Halk Bilimi Çalışmalarında Varyant ve Versiyon Sorunu*. Web: Di 20 Adar 2018'an de ji malpera www.millifolklor.com. hatiye girtin.
- Omerî, B. (2013). *Carek Ji Caran*. İstanbul: Weşanên Avesta.
- ÖNAL, M. N. (2002). *Oyun Tekerlemelerinin Yapısı Ve Türkçe'nin Eğitim-Öğretimindeki Yeri. Muğla Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü Dergisi(9), 133-149.*
- Özhan, M. (1997). *Çocuk Oyunları Kültürü*. Ankara: Kültür Bakanlığı Halk Kültürünü Araştırma Dairesi Yayınları.
- Öztürk, M. (2016). *Zûgotinok Di Edebiyata Kurdî ya Gelêrî de. Bingöl Üniversitesi Yaşayan Diller Entitüsü, 2(3), 23-43.*
- Öztürk, M. (2016). *Zûgotinok Di Edebiyata Kurdî ya Gelêrî de. Bingöl Üniversitesi Yaşayan Diller Entitüsü, 2(3), 23-43.*
- Sadinî, M. X. (2013). *Çîrokên Gelêrî*. İstanbul: Nûbihar Yayınları.
- Subaşî, K. (2014). *Jî Bo Zarokan Di Fêrkirina Kurdî De Rola Mamikan*. Mardin: Teza Lîsansa Bilind.
- Xezal, L. (2012). *Kovara Zarokên Rojê. Kovara Zarokên Rojê, 5-8.*

Yardımcı, M. (2004). *Başlangıçtan Günümüze Türk Halk Şiiri*. Ankara: Ürün Yayınları.

Yayın, N. (2009). *Oyun Tekerlemeleri Üzerine Bir İnceleme*. İzmir: Ege Üniversitesi Yayınları.

Yıldırım, A. (2013). *Herdemciwanê*. Stenbol: Weşanên Azad.

Yıldırım, K. (2016). *Kurdî 5 Kurmancî 5. Baskı, 2016*. Milli Eğitim Bakanlığı Yayınları.

Zullinger, H. (1997). *Çocukta Oyunla Tedavi*. (K. Şipal, Çev.) İstanbul: Cem Yayınları.

## PÊVEK 1

### NÎŞEYÊN BERHEVKARIYÊ

K<sub>1</sub>:

Berhevkar: Habibe Yiğit Taştan

Sala Berhevkarîyê: 2016-2018

Kesê Gotî:

Nav: Fermude Taştan

Temen: 78

Bajar: Îdir

K<sub>2</sub>:

Berhevkar: Habibe Yiğit Taştan

Sala Berhevkarîyê: 2016 – 2018

Kesê Gotî:

Nav: Fatma Yiğit

Temen: 57

Bajar: Diyarbekir

K<sub>3</sub>:

Berhevkar: Yusuf Taştan

Sala Berhevkarîyê: 2016 – 2018

Kesê Gotî:

Nav: Mehmet Ertaş

Temen: 56

Bajar: Wan-Nordiz

K4:

Berhevkar: Yusuf Taştan

Sala Berhevkarîyê: 2016 – 2018

Kesê Gotî:

Nav: Naciye Mangan

Temen: 43

Bajar: Wan

K5

Berhevkar: Mehmet Yıldırımçakar

Sala Berhevkarîyê: 2016 – 2018

Kesê Gotî:

Nav: Ayhan Kutluk

Temen: 32

Bajar: Colemêrg – Gever

K6:

Berhevkar: Habibe Yiğit Taştan

Sala Berhevkarîyê: 2016 – 2018

Kesê Gotî:

Nav: M.Faruk Yiğit

Temen: 63

Bajar: Diyarbekir-Karaz

K7:

Berhevkar: Habibe Yiğit Taştan

Sala Berhevkarîyê: 2016-2018

Kesê Gotî:

Nav: Yusuf Taştan

Temen: 36

Bajar: Îdir

K8:

Berhevkar: Yusuf Taştan

Sala Berhevkarîyê: 2016-2018

Kesê Gotî:

Nav: Abdulkadir Akman

Temen: 51

Bajar: Wan

K9:

Berhevkar: Mehmet Yıldırımçakar

Sala Berhevkarîyê: 2016-2018

Kesê Gotî:

Nav: Kıbrıs Koşmaz



Temen: 50

Bajar: Wan

K10:

Berhevkar: Abdullah Yaşın

Sala Berhevkarîyê:

Kesê Gotî:

Nav: -

Temen: -

Bajar: Cizîr

K<sub>11</sub>

Berhevkar: Yusuf Taştan

Sala Berhevkarîyê: 2016-2018

Kesê Gotî:

Nav: Zöhre Özmen

Temen: 53

Bajar: Agirî

## PÊVEK 2

### METNÊN ZÛGOTINOKAN

1.

Yekî teter

Yekî çû jor

Hat ser te dor (K<sub>10</sub>).

2.

Yek didoke du masî

Şemso Qûto rûbasî

Hinno dîno faris

Doraya te ye tu kus (K<sub>10</sub>).

3.

Yek dido sisê

Çar apê naçar

Çû serê darê

Hata xwar

Di çarde û heftê siwar

Hatin çûn çîya

Lefandin rêsîyî gîya

Pez hatin avîya

Berx çûn dangîya

Keça xweşik para min

Ya pintî dûrî min here

Were bibêjim ji te re

Şewlo hate

Eva dora te (K<sub>10</sub>).

4.

Mir Mir Berweste

Mir mir berweste,

Nanê xalê xwe dipêjim,

Ava gula dirêjim,

Ya şewiti tavêjim (K<sub>10</sub>).

5.

Heleq meleq

Dindikê leq leq

Kîso kember

Ya pêxember

Dindikê sor e

Xav e lor e

Vîna derket

Kete vî (K<sub>9</sub>).

6.

Bizdim

Badim

Bizdim

Badim

Bizdim

Badim

(Navê zarokê) ... bû pîra holikê (Yıldırım, 2016, s. 103)!

7.

Yek dudu

Mawer sisê

Simbêl baqo

Çav zîlaqo

Qirç (Çınar, 2005, s. 11)!

8.

Şemla sor e

Saqo kesk e

Gore zer e

Ax li min

Xulî li te

Arî li wî

Na na ne tu

Bist li vî (Çınar, 2005, s. 11).

9.

Hêkelî, Dûkelî

Çar lingê çûpelî

Bişkoja xemilî

An û vingo

Pê qeningo

Mastê miyan

Ser sêniyan

Cilê hilîn

Terqê vîyan (Çınar, 2005, s. 11).

10.

Ooooooooo

Yekê yekê yekaneke

Sê hacekî

Bîst qulingan

Hêkê kewê

Li bin kewê

Kew firiya

Çav rijiya

Bîst li vîya (Çınar, 2005, s. 12).

11.

Yek dudo

Bawer sisê

Çeqla fisê

Mamo dîno

Kevirê şîno

Qesra Elî

Çardeh derî

Yek jê teter

Yek jê meter

Navê Xwudê

Elahu ekber (Çınar, 2005, s. 12).

12.

Lib libê

Kertib libê

Mastê tirş

Ji bo kê

Ji min re na

Te pir divê (Çınar, 2005, s. 12).

13.

Hilifî milifî

Artûtik berwar tûtik

Şêx geylanî

Dev rûtik (Çınar, 2005, s. 13).

14.

Yeylo diklo dinoze

Şemso kito repoze

Keçê miçê yarek çê

Qare qotik fispîrçe (Çınar, 2005, s. 13)!

15.

Oooooo

Yekê yekaneke

Dilo çepo

Çepîl mijo

Xana gijo

Dotra îne

Li ser mizgîne

Golika xalan

Çû pişt malan

Ne guran xwar

Ne dizan bir (Çınar, 2005, s. 13).

16.

Yek û yek

Teyrê belek

Zaza bilbil

Dermanê dil

Şerq û şema

Li ber çema

Çem miçiqî

Av tê nema

Ez kuncî

Tu kuncî

Li ser textikê firincî

Ez firiyam

Tu ma li cî (Çınar, 2005, s. 13).

17.

Sat axa

Satil axa

Qûn axa

Hilifî milifî

Çak çulifî

Ar tûtik



Şêx geylanî

Dev rûtik (Çınar, 2005, s. 14).

18.

Ooooo

Yekê yekê

Dabistanê

Ezîzanê

Xana gijê

Dotra îne

Ser keskîne

Heba tirî

Digindirî

Şam û şe ye

Gul hine ye

Bîst li te ye (Çınar, 2005, s. 14).

19.

Hesê hesê

Dûv meqesê

Kevira hilkê

Gazî Mîrke

Mîr hecî ye

Tivingçî ye

Kew kuştiye

Xwîn xwariye

Pê miriye (Çınar, 2005, s. 14).

20.

Hatê hatê

Xemkê gotê

Kê rengê şîn kê yê zer.<sup>1</sup>

21.

Yek dudu

Mawer sisê

Çiqla fisê

Simbil baqo

Çav şîlaqo

Qirç (Çınar, 2005, s. 15)!

22.

Yekê yekê

Dukê dukê

Gula çepê

---

<sup>1</sup> [https://www.youtube.com/watch?v=2r\\_69ztAe3c&t=422s](https://www.youtube.com/watch?v=2r_69ztAe3c&t=422s).

Çep li mîzê

Tira qûnê

Guh perçûnê (Çınar, 2005, s. 15).

23.

Rêvî rêvî rindik

Serê duva rêvî bikincik

Rovî çûye mala xala

Anî heft bar ardê dara

Lê xistin bihişk û qutik û dara

Bijmêr bijmêr hek ne bîst û çara (Çınar, 2005, s. 15).

24.

Yekê

Yekê

Dabistanê

Ezîzanê

Xana gijê

Dotra îne

Serkesînê (Çınar, 2005, s. 15).

25.

Heba tirî

Digindirî

Şam şûşe ye

Gul hine ye

Bîst li te ye (Çınar, 2005, s. 11-15).

26.

Yek can,

Du can,

Sê can,

Çar can,

Pênc can,

Şeş can,

Heft can,

Heşt can,

Neh can,

Apê min î bê can (Öztürk, 2016, s. 30).

27.

Rêvî rêvî

Rêviyê rindik

Serê teriya rêvî

Pir bi pirçik

Rêvî çûye

Mala xalan

Bar kiriye

Hişk daran

De bijmêrin

Bîst û çaran

Heger bîst û çar derneket

Min têxin

Binê çalan (Öztürk, 2016, s. 30).

28.

Oo moooo Mişkella

Ket bêrîka Evdella

Evdella birê Fatê

Keçik anî civatê

Keçik bîst û sisê bû

Li ser kaniya satê bû

Hotik motik

Şivan lotik (Öztürk, 2016, s. 31).

29.

Ho kelê

Bindo kelê

Çaro çepo

Hamo mişko

Tasa Misrî

Gawir neqlî

Hepen zepen

Yaro mîro

Kurtêlo (Öztürk, 2016, s. 31).

30.

Hêklo mêklo

Çalim çêklo,

Hestiyê kewê

Li ber kewê

Kewê firî mamo gurî,

Hat ser vir da rî (K<sub>1</sub>).

31.

Hopanê, mopanê,

Kêziya minî panî,

Avêt golanî,

Golanî qamîş e,

Kekê min çawîş e,

Çawîşê bîçûk e,

Jê re anîn bûk e,

Bûk bûka Hesên Beg e,

Sêla ser kulek e,  
Çûm qûncekê tarî,  
Kewek tê de dinalî,  
Min go kewê çî hal û hewalê te ye,  
Go per û baskên min şikestî ye,  
Qefla li ser derî ye.

“Sêv sor bûne?”

“Na!”

“Bîn ji te tê” (Çinar, 2005, s. 37).

32.

Çivê çivê dev reqîs

Didim te nanê garis (K<sub>2</sub>).

33.

Gurzo Gurzo

Gurzo gurzo

Ka gurzê vê derê?

Çêlekê xwariye

Gurzo gurzo ka çêlek?

Çêlek me şerjê kiriye

Gurzo gurzo ka goştê pamiş?

Mişkê xwariye

Pişt pişt pişt (K<sub>1</sub>).

34.

Sê û sê û sê rêze

Kuro bîjo heramze

Here binê darê zivir were ve (vir)

Heke nebû bîst û çar

Serê min jî bike dar (K<sub>3</sub>).

35.

Êkan e

Dabiskan e

Xana çepê

Çepil mizê

Ara gîzê

Tote hînê

Serkêşînê

Hilkêşînê (K<sub>5</sub>).

36.

Heval hevaloşkê

Nan û penîroşkê

Hevalê min şivan e

Gopalê wî pan e



Ji bo guran derman e (Yıldırım, 2016, s. 105).

37.

Kerika kerajo

Kê te dajo (K<sub>1</sub>).

38.

Pîr pitik

Şaşa qitik (K<sub>6</sub>).

39.

Ooooo

Êkê Mêkê

Qirika çûkê

Şah bilbil

Textê çilê

Çil çîzanê

Ava rengê hezareyê

Gur gureyê

Bîst li teyê

Xwe veşêrin, va hatim we (Yıldırım, 2016, s. 103)!

40.

Pişo virda

Pişo wê da

Min şîrqamek

Li qûnê da

Pişo vay paşla (navê zarokê) .... da (K<sub>6</sub>).

41.

Mişko mişko

Neyarê nanê hişko

Nanê hişk di kur de ye

Mişko bixwo (K<sub>6</sub>).

42.

Pirê pirê ava

Çengekî der ava

Mala hewe ava

Li ser ser û çava<sup>2</sup>

43.

Hay çilî çan e

Hey!

Ser erde ban e

Hey!

Fila Xurşîdî

---

<sup>2</sup> [https://www.youtube.com/watch?v=kVQHRZWpM\\_0&t=287s](https://www.youtube.com/watch?v=kVQHRZWpM_0&t=287s).

Hey!

Ser erdê Mecîdî

Şimik hê

Hê hê

Şimik ho

Ho ho

Çîçka reş e

Reş e reş e

Çîçka 'îne

'În e 'în e

Ser baneka

Bin baneka

Ap!<sup>3</sup>

44.

Gulzerê Gulzerê

Ne kirpêm bît ne ripêm bît

Hêdî hêdî were xwarê<sup>4</sup>

---

<sup>3</sup> <https://www.youtube.com/watch?v=m-rJ8JEGhEA&t=346s>.

<sup>4</sup> [https://www.youtube.com/watch?v=2r\\_69ztAe3c&t=422s](https://www.youtube.com/watch?v=2r_69ztAe3c&t=422s).

45.

Hatê hatê

Xemkê gotê

Kê rengê şîn kê yê zer<sup>5</sup>

46.

Mamê Mûs!

Lebbê Hûs!

Bê te derbika bênamûs?

Bira bê (Akdemir, 2008, s. 371).

47.

Bûtî bûtî bût kutirmircan

Ser mircan bût kutirmircan

Nig mircan bût kutirmircan

Dûv mircan bût kutirmircan

Çav mircan bût kutirmircan

Go mircan bût kutirmircan

Dev mircan bût kutirmircan

Ha ji te re qamçî li nava van ajalan bikeve (Akdemir, 2008, s. 373).

---

<sup>5</sup> [https://www.youtube.com/watch?v=2r\\_69ztAe3c&t=422s](https://www.youtube.com/watch?v=2r_69ztAe3c&t=422s).

48.

Hêtê Mêtê

Mala me li ber pirê tê

Tajîkî ji wê da tê

Tevû xililê tê

Jê tê

...

Yek mêt, yek jin, du kur û sê keç ka bejin ev kê ne (Akdemir, 2008, s. 386)?

49.

Erê merê ê li berê

Êşê mêşê ê li pêşê (Akdemir, 2008, s. 380)

50.

Kerika ker hajotî

Ew kî ye kera mala bavê min dajo (Akdemir, 2008, s. 382)?

51.

Bir bir beran

Rabû kelan

Hîv bê?

Bira bê.

Roj bê?

Bira bê (Akdemir, 2008, s. 385).

52.

Hilerî milerî

Avê da bin derî

Bavê wî çû bajêr

Jê ra çî werî (Akdemir, 2008, s. 388)?

53.

Yekê yekê

Dûmamekê

Saet yekê çarîçekê

Ala fingo

Poz qulingo

Hestîyê kewê

Li bim mewê

Çav spîkê

Vîstavîkê<sup>6</sup>

54.

Pirrr zozano!

Ha!

Tu çî dixwî?

---

<sup>6</sup> <https://www.youtube.com/watch?v=ksKLLAY2jmY>.

Nan û mast.

Ka para min?

Di qulika darê da ye.

Ez çûm ne li wê bû.

Qey pisîkê xwariye.

Ez te bavêjim behrê yan bîrê?

Bavêje bîrê! / Bavêje behrê (Gazi, 2006, s. 110)!

55.

Peşko guro, gur tune (Gazi, 2006, s. 113)!

56.

Filan kes qerenûz (Gazi, 2006, s. 117)!

57.

Beqê

Beqê

Beqbelûsê

Were lûsê

Çavê pehnê

Ez ramûsê (Kurdo M. , 2017, s. 31)

58.

Bildim bildim bildim

Her dû çavê reş kildim

Kil ji kilê bihara

Heb ji hebê hinara

Dest avêtî çinar e

Çinarê xişxişok î

Ava Bilbilokê

Bavê Bilok çû bajêr

Çi anî çi nehanî

Heb anî şekir anî

Nav keçika da danî

Keçik keçikê Ebasa

Tena derpî û kirasa

Kirasê wan şîn dikir

Hespa keko zîn dikir

Gul û rihan bîn dikir (Kurdo M. , 2017, s. 31).

59.

Bilo Bilo bavê min!

Tiştik ketye çavê min

Xwelî be bihele

Darik be bipeke

Kevir be biteqe (Kurdo M. , 2017, s. 32).



60.

Ço ço!

Li ku rustî?

Serê çiyakî.

Kê tu jê kir?

Şêx Ebdilakî

Bi çi?

Bi baltekî

Sawa çi?

Sawa çokî

Va şuna Mistê

Va şuna Gustê (Kurdo M. , 2017, s. 32).

61.

Golika salê

Li garanê

Engo mengo

Mi çîqa xwu gomînak (Kurdo M. , 2017, s. 32).

62.

Gu'rî Gu'rî qa qa

Serê te simaqa

Lingê te toraqa

Binê te feraqa

Gu'ri çû mala xatûnê

Xatûnê pif kir qûnê

Ji bona qalibik sabûnê (Kurdo M. , 2017, s. 33).

63.

Fesê fesê fesafê

Bê dînê bê kirasê

Heqlîn

Deqlîn

Çerik

Çumul

Bisk û mil

Lolê Yasîn

Gurçik (Kurdo M. , 2017, s. 33).

64.

Heba tirî

Digindirî

Şam şûse ye

Gul hine ye

Bist li te ye (Kurdo M. , 2017, s. 33).

65.

Hesê Hesê

Dûvmeqesê

Kevira hilke

Gazî mîr ke

Mîr hecî ye

Tivingçî ye

Kew kuştiye

Xwîn xwariye

Pê miriye (Kurdo M. , 2017, s. 34)

66.

Hêkelî, dukelî

Çar lingê çûpelî

Bişkoja xemilî

An û vingo

Pê genimgo

Mastê miyan

Ser sênîyarn

Cilê hilîn

Terqê viyan (Kurdo M. , 2017, s. 34).

67.

Ha gidî mişko

De gidî mişko

Tu dijminê nanê hişko

Ha gidî mişkê wisa kovî

Tûr û barê me kir nêvi

Ax, ax, ax! (Kurdo M. , 2017, s. 34)

68.

Kê li te xist?

Pîrekê

Bi çi?

Bi badikê

Sawa çi?

Sawa goştê golikê

Ax li min wê pîrike!

Kêra reş li zikê

Ne dilê ne gurçike

Va ya garê kê ye?

Garê keça min e

Çel mî çel bizin e

Keko tu bi Xwedê ki

Teng zirav tê kî

Zirav zirav kenî

Çuçika evra pê kenî

Çûçik mara reş e

Kete qula reş e

Hem reşeka nexweş e

Ber balgî tijî qalikê zebeş e. (Kurdo M. , 2017, s. 35).

69.

Mamê Mûs

Tê te derbek bênamûs (Kurdo M. , 2017, s. 35)

70.

Quling quling rêzo

A paşîn tew rêzo

Meta mi Zinê

Kerê hildikşînê

Kera serbizengil e

Kuta serê dil e

Xwîn firya ser Mûsil e

Musil banê ser e

Herba da bi nêr e

Herba serşikestî

Herîr pê da bestî

Herîro xaso

Pê dirût kiraso

Kirasê kê ye?

Ê Fatma Nebya ne

Çêkire ser çiya ne

Diza dizî

Dizo berî bi ku da?

Bi Helebê da

Ji Şamê wê da

Şam ji ber çû

Keko ji ser gû

Keko tu bi Xwedê kî

Çengek zirav tê kî

Geniyo

Çûçik pê keniyo

Çûçik mahrê reş bû

Xuşya qula xwu (Kurdo M. , 2017, s. 36).

71.

Hê ginginê

Silama qinê

Ço li ber ra

Ba li ber ra

Mû firike

Bistike

Lîstikê

Lê ketê (Kurdo M. , 2017, s. 37)

72.

Hêkil mêkil

Çalim çêkir

Hestîyê kewê

Li binê mêtewê

Mêw ketya

Kew fîrya (Kurdo M. , 2017, s. 37)

73.

Kê fis kir?

Te kir

Nerm û fis

Fis duranê

Bîn ji kê tê gemboranê (Kurdo M. , 2017, s. 37)?

74.

Miřko!

Miřko apê miřk

Dûv rûtikê serbirîřk

Kînga pisik nayê mal

Ew tê dizîya nane hiřk (Kurdo M. , 2017, s. 38).

75.

Lib libê

Kertîb libê

Mastê tirř

Ji bo kê

Ji min ra na

Te pir divê (Kurdo M. , 2017, s. 38)

76.

Mo muřkula ket berîka

Evdîla Evdîla

Birê Fatê keçik anî

Cîvatê keçik bîst û sisê bû

Ser kanîka bilqê bû

Hotik motik

řivana lotik (Kurdo M. , 2017, s. 38).



77.

Mirîşka reşa, qija bi pûrt

Te şe kim, te hine kim

Ce bi ser te werkim (Kurdo M. , 2017, s. 38)

78.

Navê mi li navê te

Kumê mi li serê te

Bireve ez bidim pê te (Kurdo M. , 2017, s. 39).

79.

Çîroke virviroke,

Rûnê rokê, berda cokê,

Co miçiqî, rûn biriqî

Golika salê,

Li nav garane (Kurdo M. , 2017, s. 39).

80.

Ne zivistanê ne ji payvizê

Te çi li dora mi wîsewîsê

Were wa heftê pênc qurişa

Here li ser kulingê bilîze (Kurdo M. , 2017, s. 39).

81.

Nisk û nokê

Tev keliye

Kete coqê

Coq miçiq

Rûn biriqî

Lawkê paşê

Gog qumaşê

Lawkê mîra

Gog herîra (Kurdo M. , 2017, s. 39).

82.

Rêvî rêvî rindik

Serê dûva rêvî bi kincik

Rêvî çû mala axa

Anî heft bar ardê dara

Lê xistin binişk û qutik û dara

Bijmêr bijmêr hek ne bîst û çara (Kurdo M. , 2017, s. 40).

83.

Sat axa satil axa

Qûn axa qantir axa

Hulipî mulipî çarçilupî

Ar tûtik

Berwar tûtik

Evdilqadir gi rûtik (Kurdo M. , 2017, s. 40).

84.

Silêmane dunikul

Çû ser darê tirek kir

Hat bin darê fisek kir

Çû mahkemê deng nekir

Hat malê fedî kir (Kurdo M. , 2017, s. 40).

85.

Şemla sor e

Saqo kesk e

Gore zer e

Ax li min

Xulf li te

Arî li wî

Na na, ne tu

Bîst li wî (Kurdo M. , 2017, s. 40).

86.

Silo Silo

Dunikulo!

Dasê bigire

Here çilo

Holikê çêke

Zilfikê tê xe

Holik hilkişya

Zilfik tirsya (Kurdo M. , 2017).

87.

Ûniz Bûniz

Cayir çember

Malkê qembe

Taze tîze

Quncikê vîze

Piştik bilûr (Kurdo M. , 2017).

88.

Yek, dudu, sisê

Çeqla fisê

Memo Zînê

Çavhişînê

Gindir mindir

Xwu li tahtê da

Di cî da mir (Kurdo M. , 2017).

89.

Xalê Bekir

Çavê xwu vekir

Eynik danî

Li xwu mêze kir

Serê xwu şuşt

Riye xwu şe kir

Xurîniya xwu kir

Bi şîr û şekir

Şal û şapik

Li bejna xwu kir

Ne go da mi

Ne bi peyva te kir

Rabû bi rê ket

Çû Diyarbekir

Ax bê aqil

Xalê Bekir (Öztürk, 2016, s. 35).

90.

Yek, dudu, sisê

Çeqla fisê

Memê dîno

Kevrê şîno

Çavbeloqo

Simbêltoqo (Kurdo M. , 2017, s. 42).

91.

Yek

Dudu

Bawer sisê

Çeqla fisê

Mamo dîno

Kevrê sîno

Simbêl boqo

Serî doqo (Kurdo M. , 2017, s. 43).

92.

Yek dudu

Mawer sisê

Simbêl baqo

Çav zilaqo

Qirç (Kurdo M. , 2017, s. 43).

93.

Yek, dudu

Bawer sisê

Çeqla fisê

Mamo dîno

Kevrê şîno

Simbêl boqo

Çavzer doqo

Ar tûtik

Berwar tûtik

Evdilqadir

Devrûtik (Kurdo M. , 2017, s. 43).

94.

Yek dudo

Bawer sisê

Çeqla fisê

Mamo dîno

Kevirê şîno

Qesra Elî

Çarde deri

Yek jê teter

Navê Xwude

Elahû ekber (Kurdo M. , 2017, s. 44).

95.

Yeklo diklo temazê

Şemsê, qutê repazê

Geçê meçê eraqçê,

Xirnaqotik fis bircik (Kurdo M. , 2017, s. 44).

96.

Yeko duko

Du naziko

Rep e ziko

Şama quto

Êl qotikê

Serpirçikê (Kurdo M. , 2017, s. 44).

97.

Yeklo

Duklo

Dimpaze

Qereqotik

Pismircik

Keçê

Meçê

Şemso



Quto

Repazê (Kurdo M. , 2017, s. 45).

98.

Çingil mingil çarixî

Heska mala barixî

Totil eyno nêrikî

Arbizoto têrikî

Şimê we

Şimamê me

Tirkê we, xulamê me

Hilifi

Milifi

Çaçalifî

Hê mendîl axa

Mehmûd axa

Tiving çû Gawirdaxa

Pêşya pêz çû Sorava

Daye bavo otmana (Kurdo M. , 2017, s. 45).

99.

Yekî nû

Dara misto

Çepê reng

Arê ving

Hestiyê kewê

Çêlê dîk

Çavsipîk (Kurdo M. , 2017, s. 46).

100.

Yek û yek

Teyrê belek

Zaza bilbil

Dermanê dil

Şekir û şima

Li ber çema

Çem çikçiki

Av tê nema (Kurdo M. , 2017, s. 46).

101.

Oooooo yekê yekê yekaneke

Se hacekê

Bîst qulingan

Hêkê kewê

Li bin kewê

Kew firiya

Çav rijiya

Bîst li viya (Kurdo M. , 2017, s. 46).

102.

Ooooooo yekê yekaneke

Dilo çepo

Çepil mijo

Xana gijo

Dotra îne

Li ser mizgînê

Golika xalan

Çû pişt malan

Ne gur xwar

Ne dizan bir (Kurdo M. , 2017, s. 47).

103.

Yeka nekê

Gula çapê

Çepla mijo

Xana gijo

Gul tirhîno

Ser birçîno

Du maren reş

Du gulên geş

Mîr xatûn

Ez û tu

Pev ra xweş (Kurdo M. , 2017, s. 47).

104.

Yek du sê

Çiqê pisê

Mamo dîno

Kevirê Sîno

Çavbeleqo

Simbêlboqo

Ser kanîkan

Toqlê dano (Kurdo M. , 2017, s. 48).

105.

Zebeş e

Dendik reş e

Xwarin xweş e

Kalo nexweş e

Pîrê bêhiş e

Lawik keleş e

Keçik çavreş e

Karik hebeş e (Kurdo M. , 2017, s. 48).

106.

Besê

Besê

Dilmeqesê

Kevir rakin

Ba mera kin

Mer hecî ne

Tifekçî ne

Xwin xwarine

Pê mirine (Kurdo M. , 2017, s. 48).

107.

Pişo virda

Pişo wê da

Min şîrqamek li qûnê da

Goşt va ye di qulika darê da (K6).

108.

Hopanê hopanê

Keziya mine reşe penê

Min avîte gola hanê

Gola han qamûşe

Mera fûşe fûşe

Navê kekê'm çawûşe

Çawûşê piçûke

Jêra anî bûke

Bûka Qelendere

Xwayê şala zere

Şala zer du takin

Mûsil tê xweyakin

Çûçanê çûçanê

Heft qutî mircanê

Avêt gola hanê

Mîrê kelê kanê

Mîrê kelê kuştin

Hemze begê hîştin

Hemze begê têze

Deve dane rêze

Pêşî çû hevrêze

Paşî ma li Tebrêz ê (K9).

109.

Beq belûsan

Çav ramûsan

Were dîsan

...

Beq belûsan

Çav ramûsan

Were dîsan

Beq belûsan

Çav ramûsan

Were dîsan

Ne tê mo ne qeto

Jinka mele kabheto

Çavkê min kir çîzeto (K<sub>9</sub>).

110.

Hêklo mêklo

Çarim çeklo

Hestiyê kewê wê

Li ber cewê

Kewika firî

Mamkê gurî

Heban dirî

Pirrrr ser serê

Avzemê da birrî (K<sub>9</sub>).

111.

Heleq meleq

Dindkê leqleq

Kîso kember

Ya pêxember

Vîna derket

Kete vî (K9).

112.

Ha werkin werkin werkin

Ser xaniyê kê kê werkin

Ser xaniyê Ehmed werkin

Ez çûm Ehmed raza bû

Bêrîvanê berda palda bû

Binefş nav çêleka bû

Gulîzerê derî dada bû

Berfîn xemla xwe da bû

Hebek rûnê wan hebû

Binê meşka me da bû

Ehmed kura mal derkin

Jina bi qurbana me kin (K9).



113.

Edîle Naşît milqol e

Gundê me qereqol e

Ya Îsa ya Mûsa

Ketme destê ramûsa

Mele bang da

Pîrê can da

Avsîrka me sar bû

Kevçyê me xar bû

Golka me mirar bû

Dunya xira bû (K<sub>9</sub>).

114.

Pişê pişê menteşê

Nan û penêr çi xweşê

Bûka malê çawreşê

Zarok çûne camiye da

Sa girtiye pehniye da (K<sub>9</sub>).

115.

Erebo can cerebo

Te rast digot te dûz digot

Rastiya xwe digot

Qet derew ne digot

Boz diçe boz bi çenda

Boz diçe boz bi danzda

Danzdê me yek sal tamam

Yanzdê me hemlê hespan

Dehê me dehkê haciyan

Nehê me nehkê çêlan

Heştê me her du heşt şeytan

Heftê me heft ‘amîman

Şeşê me nîv sal tamam

Pêncê me pencikê şêran

Çarê me çar barê ga

Sisîyê me sê zûlfê xwe

Du dê me memikên qîza

Yek ê me yek bo xwedayê murbetê (K9).

116.

Ewdal nêvan e nêvanê mala mîr e

Bejna wî hûr e nagihêje sifra nênan e

Dibêje destê min nagihêje kevçiyê kolî reşe sifra nênan e

Xwezî yekî bihata dêrî bida bigota dewate, deweta mala mîr e

Dîna xwe dayê yekî teq teq dêrî da got werin dewate, deweta mala mîre

Ewdal belqîtî, ber mala mîr şiqîtî, boçika govendê girtî

Evare kes nabîne, Keçik haj memikan tinîne

Ewdal dewê xwe memikan de dikutîne

Ewdal here bavê keçikê yê were te bibîne (K<sub>9</sub>).

117.

Pişê pişê nêrgizê

Xwe da ser dîwarê Êngizê

Ne gura xwer ne dizê (K<sub>9</sub>).

118.

Hirçê qûnbipirçê

Guro siresiro

Kîvroşkê lephevrişkê (K<sub>9</sub>).

119.

Metê metê

Erdê ketê

Boçka qûnê

Hev derketê (K<sub>9</sub>).

120.

Berxika ber bizinê

Mişkê terazinê

Mêrê xebera jinê

Xêra yekî jî tunê (K9).

121.

Her tûmê tûmê tûmê

Werdeka li gola qumê

Çav reşê çav hêlûnê

Sûret hebka leymûnê

Qeysa lingê bigire

Ji tera bînim potinê

Heta lorî nemire

Tu çara naçim şînê

Lorî loriya Remo

Şûr kêşo bi xencer xemo (K9).

122.

Her webî webî webî

Desmalek çargoşe bî

Goşe li goşê zêdebî

Ser milê min û te bî

Her goşê şalek lê bî

Her şalê cêvek lê bî

Her cêvê sêvek lê bî

Her sêvê kêrek lê bî

Her kêrê qaşek lê bî

Her qaşê navek lê bî

Navê yekî altûn bî

Navê yekî xatûn bî

Navê yekî zeytûn bî

Navê yekî esmer bî

Esmerê por kurîşkê

Tejiyê berda kevroşkê

Esmerê rû bi xalê

Kêvroşkê xwe da palê

Tejiyê berda xezalê (K9).

123.

Ax la silê la silê

Daxa dilê min silê

Kula dilê min silê

Kesera dilê min silê

Mamê silê ya sitar

Nan garise naçe xar

Hurê malê hemû xwar

Wîy du gur hatin ber derî

Reş xwerin mane serî

Mixtaro bextê te me

Mele yo bextê te me

Ne min got kerê bernede

Ne min got heşe bernede

Ker kişiyane delê de

Arvan tinê di malê de

Rûto xwe da palê de

Daxa dilêm

Kula dilêm

Kesera dilê min silê (K<sub>9</sub>).

124.

Ha rovî rovî rindiko

Ha rovî rovî mamê min

Dev kutaye paqa min

Rovî hate nav mala

Bigirin bidin ber dara

Roviyo dev şûjino

Dev kutaye lingê mino (K<sub>9</sub>).

125.

Sê ker hatine dinê

Merivê bide hevraza bikşîne titûnê/qelûnê

Mala xwe barke here cem mala bavê jinê

Sinya wê were 'erdê nanê xwe bixwe bi tenê (K9).

126.

Jinkê gote mêrê xwe

Biharê pez

Payîzê rez

Zivistanê jî ez (K9).

127.

Salihê rîspî çî bixo

De bira bixwo

Yê gû bixo

De bira bixo

Yê gûyê zerdemêşê bixo (K9).

128.

Ez çûkim çûk a biçûk im,

Goşt ê min parîkek,

Xwîn a min kevçîkek,

Guneh ê min bar û piştîkek (K9).

129.

Heleq meleq

Dindkê leq leq

Kîso kemer

Ya pêxember

Dindkê sor e

Xav e lor e

Vîna derket

Kete vî (K<sub>5</sub>).

130.

Êkan e

Dabiskan e

Xana çepê

Çepil mizê

Ara gîzê

Tote hînê

Serkêşînê

Hilkêşînê (K<sub>5</sub>).

131.

Hêkê mêkê

Çamûr çêkê

Ava rûngê

Du qulingê

Mehîna salo



Qûn sipî yê

Ser serê kê de dirî ye (K5).

132.

Heblan deblan

Çîlo çeplan

Bisko enber

Xatûn gozel

Perê çukê

Wê li gedukê

Mam Emero

Xwelî sero

Here dero (K5).

133.

Hêklo mêklo

Çar im çêklo

Biska Xemê

Ara fingê

Pê qulingê

Hate vî ya

Danî vîî ya (K5).

134.

Rihmet li dêwbavê guhdaran

Xêncî yên qulên dîwaran

Tehsîldar û mixtaran (K<sub>9</sub>).

135.

Silêmanê du nukil

Çû Îranê şixul kir

Hetanî hat jinik mir

Kumik danî bavo kir (K<sub>7</sub>).

136.

Yek du sê

Çeqla fisê

Emo Dîno

Kevrê şîno

Qesra elî

Çarde derî

Yek lê peder

Yek lê meder

Ellahû Ekber<sup>7</sup>

---

<sup>7</sup> <https://www.youtube.com/watch?v=ksKLLAY2jmY>.

137.

Şokî sabûn

Du şo sabûn

Sê şo sabûn

Çar şo sabûn

Pênc şo sabûn

Şeş şo sabûn (K<sub>6</sub>).

138.

Heft heft heft zêwî,

Heft heft heft fêkî

Heft hirç, heşt hirç,

Heft heşt hirçên bipirç (K<sub>6</sub>).

139.

Bivrê badayî darê da mayî

Bivrê badayî bayê da mayî (K<sub>2</sub>).

140.

Mîn dît gurek li ser girek,

Gurê ker, ker ker kir (K<sub>2</sub>).

141.

Tişt in mişt in,

Sernivîşt in,

Baran barî xwe guviştin (Güneş, 2013, s. 26)?

142.

Min pêçiya xwe da quna qijikê,

Qijikê got qijt,

Qijikê qûna xwe da pêçiya min,

Qijikê got qijt (K<sub>6</sub>).

143.

Guvîş vîjik di kevçî da,

Min guvîş xwar vîjik ma di cî da

Sêv gindirî min sêv xwar,

Gû gindirî min sêv xwar (K<sub>6</sub>).

144.

Sê selek ji wir de hat,

Yek tû yek mû yek gû,

Bi deva çûm tû

Bi destan çûm mû,

Bi lîngan çûm gû (K<sub>6</sub>).

145.

Sêva sor e

Sila sor e

Sêv ê dixwim

Silê naxwim (K<sub>9</sub>).

146.

Rûvî li rê zivirî

Rê li rûvî zivirî (K<sub>1</sub>).

147.

Siyê here qîza te digrî

Tavê were kurê te digrî (K<sub>9</sub>).

148.

Dest davêjimê,

Dev davêjê (K<sub>11</sub>).

149.

Silqe sor e,

Sile sor e,

Silqê dixwim,

Silê dihêlim (K<sub>11</sub>).

150.

Peşk mişk tev ser kevçî, peşkê dixwim, mişk ma çi (K<sub>11</sub>).

151.

Sê tasa nekişî, sê sî si bizmara direqisî (K<sub>11</sub>).

152.

Silê dibezim,

Sêvê digezim.

Du dir, du çir, du çivîk valî avê (K<sub>11</sub>).

153.

Satilek wê de tê, tê de heye tû, mû, gû.

Deva diçime tû, desta diçime mû, pîya diçime gû (K<sub>11</sub>).

154.

Du dir, du çir, du çivîk, valî avê

Du dir, du çir, du çivîk, walî avê van du dir, du çir,

Du çivîkê valî avê

Gotine wan du dir, du çir, du çivîkê walî avê:

Em, du dir, du çir, du çivîkên valî avê ne (K<sub>11</sub>).

155.

Derzî derzî çil derzî

Derzî di qulika derziya diya min de bezî (Güneş, 2013, s. 37).

156.

Derim narim,

Digerim nagerim,

Vedigerim venagerim,

Derim digerim vedigerim (Kurdo, 2015, s. 36).

157.

Şemo şemo,

Sê sêşeman,

Sê şo sabûn,

Şabaş daye (Kurdo, 2015, s. 36).

158.

Beran û beraz di malê de,

Min beran xwar beraz ma di malê da (Kurdo, 2015, s. 36).

159.

Heft hesp,

Heşt hesp (Kurdo, 2015, s. 36).

160.

Darê min qul,

Darê te qul,

Darê te di qulika darê min ê qul da (Kurdo, 2015, s. 36).

161.

Hûrik hûrik,

Darik tûrik (Kurdo, 2015, s. 36).

162.

Kiş mirişkî,

Qûtê qopê, kox (Kurdo, 2015, s. 36).

163.

Min zû got

Wê pez dot

Wî nan sot,

Wan kir cot (Kurdo, 2015, s. 36).

164.

Pişk û mişkê di kolê da.

Min pişk xwar û mişk ma tê da (K<sub>2</sub>).

165.

Heft teşt mist nîsk (K<sub>2</sub>).

166.

Kurm qurm qul kir (K<sub>2</sub>).

167.

Lek-im çê

Lek-im çê

Lek-im çê (K<sub>7</sub>).

168.

Lik-im go

Lik-im go

Lik im go (K<sub>7</sub>).



169.

Le-me tû

Le-me tû

Le-me tû (K<sub>7</sub>).

170.

Ka heft caran bêje heft

Heft, heft, heft, heft

Kire kire (K<sub>7</sub>).

171.

Kezî zera li hewa

Fistan sor e li dewa

Kezî zera xwe nadim

Bi heft lawan Kezîzera huthutî

Cêr ji milan şiqitî (K<sub>7</sub>).

172.

Hêlkê şimqet

Nav guhê te ket

Tu bi ehmeq (K<sub>10</sub>).

173.

Ha rût,

Ma rût

Qûn rût (K<sub>10</sub>).

174.

Tiklik lik kevano,

Hêlik reşo mêrano

Navê jina te çiyê,

Navê jina te hînge,

Êgir girte delînge,

Agrê rulê çî xweş e,

Xweli ser ê hebeş e,

Hebeş kabê ribaye

Savarê duxê gû nayê

Hêron ê duxê lê nay (K<sub>10</sub>).

175.

Har tutik,

Bawer tutik,

Şêx Zeynalê dev rutik,

Feqe Birahim ê ling şunik (K<sub>10</sub>).

176.

Metê

Qûn sepetê

Hevîrê Xwedê li qûnê ketê (K<sub>6</sub>).

177.

Apo apo

Simêl kapo

Gazî sê ke

Sê derman ke

Bişkulê bîn ke

Qantirê zîn ke

Apo pufî karê kir

Kar melisî

Apo bin da fetisî (K<sub>7</sub>).

178.

Mûsê Besê

Fis kire tasê

Da ser masê

Şande Qersê (K<sub>7</sub>).

179.

Misto misto

Hêlik sisto

Dîk lê xisto

Çav derxisto (K<sub>7</sub>).

180.

Heblan deblan

Çîlo çeplan

Bisko enber

Xatûn gozel

Perê çukê

Wê li gedukê

Mam ‘Emero

Xwelî sero

Here dero (K<sub>5</sub>).

181.

Her hebî her hebî

Ji vî çebebî

Salê hebek hebî

Ew jî li mala me bî (K<sub>10</sub>).

182.

Evelim develim,

Çeltik çember,

Misk û amber,

Toze li berber,

Anciq manciq,

Lepe û caciq,

Cevzer doqo,

Ar tûtik,

Şêx Gêlani,

Dev rûtik (K<sub>10</sub>).

183.

Hêkê mêkê,

Qutka çêkê,

Hebil millû,

Nextê çillû,

Ava ringê,

Da qulingê,

Çawişiyê,

Evdaliyê,

Di marê reş,

Di gwulê geş,

Mir xatunê,

Ez û tu xweş (K<sub>10</sub>).

184.

Yek û yek,

Çuka belek,

Zadkê bilbil,

Dermanê dil,

Şekr û şema,

Wêl ber çema,

Çem teqine,

Sibhi rabin,

Av lê nema,

Ew ziwana

Nêv genima,

Ew fincana

Dest hakima (K<sub>10</sub>).

185.

Qurbanê qurbanetê,

Giskê rizyanetê

Bêhna xweş

Ji mala me tê (K<sub>10</sub>).

186.

Niskê, nokê,

Mala Hemê diskê

Çi tînê çi naynê

Şe'ra gul gulî tînê

Nêv keçika wertinê

Keça mirê beraza

Şûr dikşînê heft gaza

Keka meydanê bi xaze (K<sub>10</sub>).

187.

Bûka me baran dixwaze,

Golikê me giya dixwaze,

Kalikê me dia dixwaze

Heneqneqî walwâlî,

Bûka me beran divê,

Golka me giya divê,

Melayî zikat divê,

Me bi xwe genmê sor divê (K<sub>10</sub>).

188.

Ewrê here zarokên te birçî ne digrîn

Tavê were zarokên te têr in raza ne (K<sub>6</sub>).

189.

Qerqûş merqûş,

Xwedê kurkî bavê dergûş,

Ka dasê bide min, ez herim pûş (K<sub>2</sub>).

190.

Bûka me baran dixwaze

Golika me gîha dixwaze

Yek Elî, yek Emer

Ser doşeka pêxember (Gazi, 2006, s. 105).

191.

Bûka me baran dixwaze

Golka me giya dixwaze

Rebî tu baran bidî

Milk û mala av bidî (Gazi, 2006, s. 105).

192.

Baranê bibar bibar

Sêwiya serê hev û du xwar.

Şûlikê me şûl avi divê

Genimê me baranî divê (Gazi, 2006, s. 105).



193.

Golika me destîkî giha divê

Melayê me jini can divê (Gazi, 2006, s. 105).

194.

Van tû tirî

Şalê... (navê kesê) dirrî

... (navê kesê) bo girî

Babê bo durî (K<sub>4</sub>).

195.

Go here

Come were

Qapî der e

... (navê kesê) ker e (K<sub>8</sub>).

196.

Ebcêd hewez hutara,

Helaw çêke,

Ji Baba Seyda ra (K<sub>6</sub>).

197.

Çarê çemrê çêlekê,

Heştê dêla zopekê,

Didoyê bela vîtekê (Guhan) (Gazi, 2006, s. 14).

198.

Cindik mindik,

Baz da quncik,

Bê dil û bê gurçik.

(Çirçirik) (Gazi, 2006, s. 14).

199.

Çiring çiring çarxane, kûpikê bizir barxane. (Hêjîr) (Gazi, 2006, s. 14).

200.

Çîz tê çîze-vîz tê,

Teq tê teqe-req tê,

Gur tê bi gure-gur tê,

Rev tê bi reva gur tê.

Ev çi ye? (Bangeran) (Gazi, 2006, s. 15).

201.

Dara çinçinê,

Pelê gozel çinê,

Kî mêr e hilçinê.

(Qur'an) (Gazi, 2006, s. 15).

202.

Çûm û çûm du rêz morî,

Çûm û çûm du qulê tarî,

Çûm û çûm du çirê reş ronî,

Çûm û çûm du marê reş,

Çûm û çûm meydana xweş û dehla hûta. (Ser û çav) (Gazi, 2006, s. 15).

203.

Darole darole,

Ortası çennole,

Qaqlovîsko çirtole

(Dewkil) (Gazi, 2006, s. 16).

204.

Deh li duda,

Dudu li deha,

Serî li qûnê,

Qûn li erdê

(Însan û guhan) (Gazi, 2006, s. 16).

205.

Gayê hekariya

Ketiye genimê berwariya,

Ga bê hestî,

Genim bê bistî (Sipî) (Gazi, 2006, s. 19).

206.

Hanîka manika,

Ferşê ber devê kanîka (Cemed) (Gazi, 2006, s. 19).

207.

Hanyana manyana,

Ferşê deryê kanyana,

Rê nade karwanyana (Qerîsek) (Gazi, 2006, s. 19).

208.

Heçka meçka, fiç û faç û fiz dewrêş. (Mar) (Gazi, 2006, s. 19)

209.

Carek ji caran rehme li dê û bavê guhdaran... (Farqînê Î. , 2011, s. 121).

210.

Carek hebû ji caran, rehme li dê û bavê guhdaran ... (Yıldırım A. , 2013, s. 13).

211.

Carek ji caran

Rehme li dê û bavê guhdaran,

Nelet li şeytanê ber dîwaran.

Hebû nebû

Ji Xwedê meztir kes nehebû (Fîdan, 2014, s. 46).

212.

Çi hebû çî tunebû... (Akdağ, 2016, s. 19).

213.

Hebû tunebû,

Rehme li dê û bavê min û we bû.

Hebû gundek ji gundan,

Gundekî ava,

Gundekî bi xêrûbêr... (Yıldırım A. , 2013, s. 74).

214.

Hebû nebû

Ji Xwedê û Pêxember mestir ti kes tunebû... (Fîdan, 2014, s. 109).

215.

Hebû tunebû,

Rehme li dê û bavê min û we û guhdaran,

Ji bilî şeytanê kor,

Deherandî,

Li ber dîwaran... (Omerî, 2013, s. 57).

216.

Hebû tunebû,

Rehme li dê û bavê min û te bû;

Li dê û bavê guhdaran,

Ji bilî şeytanê ber dîwar û cerdevanên şaş û har... (Omerî, 2013, s. 97).

217.

Hebû carek ji caran,

Rehmet li dê û bavê hazir û guhdaran.

Hebû... (Yıldırım A. , 2013, s. 97)

218.

Hebû carkê ji caran,

Rehme li dê û bavê hazir û guhdêran,

Ji xilaf şeytanê kor î ber dîwaran (Yıldırım A. , 2013, s. 171).

219.

Hebû tunebû...

Roj roja diçe,

Meh meha diçe,

Sal sala diçe... (Celîl & Celîlê , 2013, s. 251).

220.

Hebû tunebû,

Carek ji caran,

Rehmet li dê û bavê guhdaran,

Bi tevî derî û cîranan,

Bi tevî pepûk û xizanan... (Farqînî Î. , 2011, s. 95)

221.

Ji xeynî Bekoyê Ewanan

Ji xeynî Rom û Ereban,

Ji xeynî Papaxgeniyan... (Farqînî Î. , 2011, s. 95)

222.

Wî got,

Min got,

We dot,

Ba hat,

Bahoz hat,

Kêçên Bexdayê hat,

Dengê dêwan hat,

Şenglo birev bivirê,

Menglo birêv tevîrê,

Na na,

Devên xwe vekin çavên xwe bigirin (Farqînî Î. , 2011, s. 95).

223.

Yê hat Elî Lawo ye Elî Lawo rojekê (Farqînî Î. , 2011, s. 95).

224.

Xencî cicirkê quîê dîwara, vezîrê wîzara (Farqînî Î. , 2011, s. 95).

225.

Carek li caran, rehmet li hazir û guhdaran, xêncî yên qulê dîwaran.

‘El‘ele rahî, guneh li sikura şeytên be.

Berê sal û zeman bû, niha bûye zar û ziman.

Ez serê te neêşnim, serê dijminê te biêşnim.

Baqek gul û sosin, binevş û nergiz, rihan û beybûn, çîçek û pêçekan li ber serê te da biçikînim, pê xem û xiyalên dilê te birevînim (K<sub>9</sub>).

226.

Rojekê ji rojên Xwedê ... bi zarê êzidiyan (Farqînî Î. , 2011, s. 95).

227.

Carekî cebarekî

Kosî baz da ser darekî

Dar hejiya kosî vejîya

Kosî ket, herdu çavên wî derket (K<sub>11</sub>).

228.

Carekê, cebarekê,

Kûsî rabû sere darekê,

Dar hejiya, kûsî meşiya,

Cotikê çevê wî rijya (Cindî, 2009, s. 124).



229.

Çirokê çîvanokê

Xetxetokê bajarokê

Gongolokê şivanokê (Yıldırım A. , 2013, s. 224).

230.

Pişê pişê çav mişmişê

Mêvan rojek, didu, sisê

Pişê pişê,

Çav xezalê

Pir xweşik,

Gula malê

Mêvan naçe heta dortira salê (Bozarşlan, 2007, s. 86).

231.

Şenga min Penga min

Dayik çûye zozanan

Xwariye pelên kizwanan

Şîr ketiye guhanan

Zû bikin, derî vekin

Dayik hatiye danan (K<sub>2</sub>).

232.

Beq belîs were lîs

Kurikê mîran çav ramîs

Beq belîs were lîs

Kurikên mîran çav ramîs.

Beq belîs were lîs

Kurikên mîran çav ramîs.

Ne têmo neqeto

Jinika te ya qehpeto

Çavê min kir şeweto (K<sub>2</sub>).

233.

Bet û bet ela beteytî

Bet û bet kakl û Kurbeytî

Bet û bet xews û madella

Kê genime pişta pirê xwariye xenîm û elaaa!

Qaz û qaz ela qazeytî

Qaz û qaz kakl û Kurbeytî

Qaz û qaz xews û madella

Kê genime pişta pirê xwariye xenîm û elaaa!

Zir û zir ela zireytî

Zir û zir kakl û Kurbeytî

Zir û zir xews û madella

Kê genime pişta pirê xwariye xenîm û elaaa! (Gazi, 2006, s. 100-101).

234.

Û rehme li dê û babê hazir û godara (Farqînî Î. , 2011, s. 16).

235.

Çîroka me çû dîyaran,

Rehme li dê û bavê xwendevan û guhdaran (Yıldırım A. , 2013, s. 68).

236.

Çîroka min ji we re xweş,

Ka telaşek şebeş (Yıldırım A. , 2013, s. 85).

237.

Çîrok çû bin deviyar, rehme li dê û bavê me hemûyan (Yıldırım A. , 2013, s. 96).

238.

Gihîştin miradê û mexsedên xwe,

Aqûbet li ser we (Fîdan, 2014, s. 116).

239.

Çîroka min li diyaran,

Rehme li dê û bavê hazir û guhdaran,

Ji bilî fesadên ber dîwaran (Yıldırım A. , 2013, s. 193).

240.

Çîroka me çû dîyaran,

Rehme li dê û bavê guhdaran,

Ji xeynê fesadê ber qulikê dîyaran (Akdağ, 2016, s. 18).

241.

Her kes digihije mirazê xwe.

Pahniya emrê xwe di nav kêf û şahiyê de dijîn (Akdağ, 2016, s. 44).

242.

Çîroka me çû liqatê,

Rehme li dê û bavê civatê (Akdağ, 2016, s. 72).

243.

Çîroka me çû dîyaran,

Rehme li dê û bavên guhdaran,

Ri xeynê hesapgir û tehsîldaran (Akdağ, 2016, s. 116).

244.

Çîroka min xweş, ka difilek zebeş (Öztürk, 2016, s. 33).

245.

– Tû tû tû tû! Min çixna lingê xwe da bi heft nanan.

– Tû tû tû! Min heft nan da bi heft beranan.

– Tû tû tû! Min heft beranan da bi bûkekê.

– Tû tû tû! Min bûkek da bi bilûrekê.

– Tû tû tû! Tû tirû tûtû, tû tirû tû tû... ()

246.

Beq belîs were lîs

Kurikên mîran çav ramîs.

Ne têmo ne qeto

Jinika te ya qehpeto

Çavê min kir şeweto (Omerî, 2013, s. 39).

247.

Kuro evdo Mêrik!

Ma sibê tu dê neyî ser erdik?

Ez ê te bikim k.r û gunik (Omerî, 2013, s. 39).

248.

Kê kuşt?

Min kuşt.

Kê şûşt?

Min şûşt (Akdağ, 2016, s. 74).

249.

Kekû kekû

Kamî kişt?

Min kişt, to kişt

Kerda kolanî kişt!

Dêla damarî kişt!

Kekû, kekû

Kamî kişt?

Min kişt

Kamî şit?

Min şit (Xezal, 2012, s. 5-8).

250.

Hoste necar, razê wey her car

Risqê sibê li Elahê Cebâr (Fîdan, 2014, s. 50).

251.

Çend Mêr Kirine?

Şeş û şeş, şeşekî dî

Du mela û şeşekî dî

Bavê te yê rehmetî

Du kesên dî

De lawo, destê mi bi hevîr e

Bi xwedê mi hew di bîr e (Bozarşlan, 2007, s. 16).

252.

Hebû qirşikek kêzikek û tertikek,

Ba hat qirşik firiya

Baran hat tertik hiliya

Hingê kêzê kenîya rovî tirtika wê qetiya (Yıldırım A. , 2013, s. 252).

253.

Hebû tunebû bûkek hebû

Rojek ji rojan, carek ji caran bû

Navê wê bûkê Zexê bû

Heya ku savarê me hebû

Zexê bûka me bû

Piştî ku savarê me xilas bû

Zexê çirtek da xwe ji me derbas bû (K<sub>11</sub>)!

254.

Ket im quncikê tarî

Teyrek nalenal e

Teyro çi hawarî?

Teyro:

Baskê min şikestî ye

Kevir li min riştî ye

Hevîr li min xas e

Bin tûrik kiras e

Kirasê Nebî ya

Avêt ser derî ya

Diza ji min dizî

Dizo virda wêda

Mala apê Hesen da

Mala apê Hesê xayê hespê boz e

Hespê boz ser da

Zînê zîv berda

Heyanî Dutaxê wêda (K<sub>11</sub>).

255.

Suwaro suwaro

Bastêqê kelandî xwaro

Vîjik barda dîwaro

Tu çûyî dîwana mala mîr

Mişkê me

Mişkalotê me

Estî kotî me

Diwandirê me

Vayê li dîwana mala mîr

Bêje: “Kêzer xatûn erxe duşmîş”

Ha ke öldî, ha ke öldî (Akdemir, 2008, s. 310).

256.

Li min kêça kezî kurî

Îro sê roj e Mîr Kumorî

Di bin bangeranê da mirî



L imin ava lişo pişo

Keça kezî kurî

Îro sê roj e Mîr Kumorî

Di bin bangeranê da mirî

Li min kendalê herîşo

Ava lişo pişo

Keça kezî kurî

Îro sê roj e Mîr Kumorî

Di bin bangeranê da mirî

Li min nêriyê rî kur kirî

Kendalê herîşo

Ava lişo pişo

Keça kezî kurî

Îro sê roj e Mîr Kumorî

Di bin bangeranê da mirî

Li min dara pel weşandî

Nêriyê rî kur kirî

Kendalê herîşo

Îro sê roj e Mîr Kumorî

Di bin bangeranê da mirî

Li min qijika dûv şikandî

Dara pel weşandî

Nêriyê ri kurkirî

Kendalê Herîşo

Ava lişo pişo

Keça kezî kurî

Îro sê roj e Mîr Kumorî

Di bin bangeranê da mirî

Li min bavê teyî mer di qûn da

Qijika dûv şikandî

Dara pel weşandî

Nêriyê ri kurkirî

Kendalê herîşo

Ava lişo pişo

Keça kezî kurî

Îro sê roj e Mîr Kumorî

Di bin bangeranê da mirî (Akdemir, 2008, s. 311-313).

257.

Bizê bizê şîr şîr

Pîrê Pîrê

Dûvlaçikê min bida

Ez harim bi şerike bavê xwe da

Devî devî çûlo çûlo

Bizê bizê, şîr şîr,

Pîrê pîrê

Dûvlaçikê min bida

Ez harim bi şerikê bavê xwe da

Hedad hedad dasê dasê

Devî devî, çûlo çûlo

Dûvlaçikê min bida

Ez harim bi şerikê bavê xwe da

Tutu tutu kaka kaka

Hedad hedad, dasê dasê

Devî devî, çûlo çûlo

Dûvlaçikê min bida

Ez harim bi şerikê bavê xwe da

Kûvar kûvar qût qût

Tûtû tûtû kaka kaka

Hedad hedad, dasê dasê

Devî devî çûlo çûlo

Dûvlaçikê min bida

Ez harim bi şerikê bavê xwe da

Tibvê tibvê, kixê kix e

Kûvar kûvar qût qût

Tutu tutu kaka kaka

Hedad hedad dasê dasê

Devî devî çûlo çûlo

Dûvlaçikê min bida

Ez harim bi şerikê bavê xwe da

Kadîn kadîn, ka ka

Tibvê tibvê, kixê kix e

Kûvar kûvar, qût qût

Tûtû tûtû, kaka kaka

Hedad, dasê dasê

Devî devî çûlo çûlo

Dûvlaçikê min bida

Ez harim bi şerikê bavê xwe da (Akdemir, 2008, s. 306-307)

258.

Huseyn got:

Qey mir ew roviyê ku dihatin loşa

Bi çaqê bigir bavêj nav telaş û melaşan

Rovî got:

Herê Huseynê ber heft aşan

Mîn tu kir xwediyê kurk û qumaşan

Min tu kir zavayê mîr û paşan

Ez mirime îro bûme roviyê çikal û loşan

Bi çaqa min digirin win davêjin nav telaş melaşan (Akdemir, 2008, s. 309)

259.

Sibata dînik

Sibata tiroviro

‘Edara sî û du ro

Nîsan a me ye

Gulan textirme ye (Akdemir, 2008, s. 403).

260.

Huvdeyê ‘edarê

Berfê da guliya darê

Nema heta êvarê

Huvdeyê ‘edarê

Melaîket hatin xwarê

Hey kirine buwarê

‘Edar e

Sibê sar e

Nîvroyê

Se xwe davêje siya dîware

‘Edar e

Dew li dar e

Ne li va ye

Deng li Meşkenî û ‘Embar e

Li mala kotî û çav nebar e

‘Edar e

Mehkî sar e

Ne ziftan e

Ne biwar e

Şeşê ‘edarê

Tê denge kare

Gulana rengîn

Gulan da ço

Bê gîdiş naço (Akdemir, 2008, s. 403).

261.

Xwişka adar, ha xwişka adar,

Tu bide du roj û danekî xedar,

Ez ê piyê gîsko di sergo da hikim xwar (Gazi, 2006, s. 106).

262.

Xweha min î adarê,

Bide min sê rojê xedarê,

Ez gîskê pîrê ji tehtê bînim xwarê (Gazi, 2006, s. 107).

263.

Xaleta adar,

Bide min du roj xedar,

E gîska girro serê sergo de bikim xwar (Gazi, 2006, s. 107).

264.

Havîn e

Dewî şîn e

Bizin xem nîn e (Akdemir, 2008)

265.

Hay li min hay

Bi şev hewr û bi roj say

Mîn li riyê bavê wî nekesi gayî

Kaya wî di kadînê da mayî

Neda çêleka mina zayî (Akdemir, 2008, s. 404).

266.

Sêzdehê Hezîranê

Roj zivirî ziftanê

Sêzdeyê Kanûna

Li ba ket gul û leymûna (Akdemir, 2008, s. 404).

267.

Pêl û Mêzîn çûn ava

‘Ecêb dinya neket ser ava

Qurixê havêtin

Agir bi dinyayê nexistin (Akdemir, 2008, s. 404).

268.

Bûka me baran dixwaze,

Golikê me giya dixwaze,

Kalikê me dua dixwaze,

(Gazi, 2006, s. 108).

269.

Serê salê binê salê

Tozkî bavê binê çalê

Pîr qurbana gunkê kalê (K<sub>9</sub>).

270.

Serê salê binê salê

Xwedê kurkî bide vê malê (Gazi, 2006, s. 107).

271.

Halalûgê hate xwarê nate xwarê

Xwedê bide kurek vê malê (Gazi, 2006, s. 107).

272.

Serê salê binê salê,

Xudê zarokikî bide kebaniya malê,



Heçiya bide bila bide,

Heçiya nede marik pê ve de (Gazi, 2006, s. 108).

273.

Aşûr maşûr,

Qeda, bela, êş û elemê ji vê malê dûr bikeve (Gazi, 2006, s. 108).

274.

Serê salê binê salê

Xwedê bihêle malxweyê malê.

Qerqûş merqûş

Xwedê kurkî bike dergûş

Ka para min,

Kakil û mewûj.

Serê salê binê salê

Xidir hatiye vê malê (Gazi, 2006, s. 108).

275.

Çi şev çî roj,

Çî nizar çî beroj (K9).

276.

Heft zîp in heft,

Heft berzîp in,

Heft tene heft tentene,

Heftê din bihara melle (K<sub>9</sub>).

277.

Babûta xweş babûta

Sala duduya çûme çiya

Du pîra dew dikêyand

Pîrê pîrê pîçî rûn bide ser hesanê min

Diçim ser çil rezan

Gayê reşê qîr sere xwe da nav du keviran

Jê derxist da nav du kepiran

Jê derxist du qîzê du vezîran

Yek ji ma û yek ji ta

...

Tepana yekane

Tepana duyane

Tepana qedyane

Kulmika yekane

Kulmika duyane

Kulmika qedyane

Qurmuçka yekane

Qurmuçka duyane

Qurmuçka qedyane (Akdemir, 2008, s. 379).

278.

Baranê bibar bibar

Çûçikan genime te xwar

Sêwiyan serê hev xwar (Gazi, 2006, s. 105).

279.

Şivan got ê:

Kêzê, kêzxtûnê, ji kû teî û bi kû da terî?

Kêzê gote şivanî:

“Ez ji xwe re li mêrekî digirim; dikim bizewicim.

Şivan gote kêzê:

“Ev e ji te re mêrek ma tu min nakî?

Kêzê:

“Ez te dikim; lê çaxê ko tiwê biqehirî, tiwê bi ci li min xînî?

Şivan got ê:

Bi darê xwe.

Kêzê:

Ez debar nakim, darê te stûr e, tiwê min bikujinî.

Kêzê da rê û çû; rastî mişkekê hat. Mişkê je pirsî:

Kêzê, kêzxtûnê, tu ji kû têî û bi kû da diçî?

Kêzê:

Ez ji xwe re li mêrekî digirim.

Mişkê: Ev e ji te re mêrek, ma tu min nakî?

Kêzê:

Ez te dikim, lê çaxê bihina te ji min teng bû, tiwê bi çi li min xinî?

Mişkê:

Bi boçika xwe (Daweta Kêzê, 1942, s. 2).

280.

Min çêrek da çêrek da kewê lal

Kewekî dî hat şûnê

Xweş mêr e ji bo xurînê

Pê de çûm nêçîrê

Neçîr û hevres e

Av çînî teji li ber

Teji li ber

Teji bera me pirsî

Ew kitika li ber milîsî

Pencê wê jehra werê

Kes jê makin bawerê

Tizara hêsaril kizrê dara

Şêrê sor ketî mixara

Şêrê sor qeliyê qut kir

Qeliyê qut, kir keşkê dawî

Bereke hat dest

Çû çep û li dizê kete şkest

Axîm dîza çembil ben

Axil minê kewê siher xwîn

Singê kewê kir nefûr

Nefur û dûn zurnewê

Quzulqurt û çû firînê (Fîdan, 2014, s. 149).

281.

Çil derzî,

Çil û çar derzî,

Qula derziyê de bezî?

(Ta), (Güneş, 2013).

282.

Kundir kundirê Eyşanê

Çêtire jê genimê Derûnê

Hemo û Çeto bira ne

Rahêjitin kerk û kalan e

Qetirkê kundir biha ne

Nadime gundî û ciran e (K<sub>10</sub>).

283.

Carek ji caran rehme li dê û bavên xwendevan û guhdaran. Ji xeynê cendirme û tehsîldaran. Hebû nebû tu kes û tu tişt ji xwedê mezintir nebû. herwisa tu kes ji rovî fêlbaztir û ji hirçê bêaqiltir nebû (Sadinî, 2013, s. 33).

284.

Carek ji caran, rehmet li dê û bavê zehmetkêş û xwendevanan... (Sadinî, 2013, s. 39).

285.

Sibatê gotiye:

Ey xwîşka 'Edar

Bide min bide min rojê xidar

Ez dûv li gîskê bikim dar

Di sergoyê rabikim xwar

Sibat sibatî

Gul û giya ribitî (Akdemir, 2008)

286.

Qerqûş merqûş,

Xwedê kurkî bavê dergûş,

Ka dasê bide min, ez herim pûş (Gazi, 2006, s. 108).